Rupel 1+++++++++++:Layout 1 25.04.2010 17:24 Page 1

## Estanekê sewregî

*"Estaneka min a reş / Şîya derde keleş / Arişte ma re ne gawiran ra şiro"*
Kitaba Feyza Adabeyî "Estanekane Sewregî Ra" bi deste weşanxaneye vateyî neşiryayo(neşir biyo). Kitab arekerde yo û teda dormeye Sewregî ra 43 estanekî (sanikî) estêy. No eser esereko vijnaye yo. Çike: Nuştoxa eseri yew ciniye ya ke hetani ewro miyane ciniyane dimilîyan de ra kese nuştoxi af tay vejiyaye. Kar û barê ziwan û edebiyatî de, ciniyan ca negirewto. Çi heyf ke, hetani ewro ziwan û edebiyata ma deste cinîyan re merhûm mendo... RÛPEL - 11






## Dengbêjî huner, wêje û dîrok e

Heta niha der barê kurdên ku li welatên Qafqasyayê dijîn de pir hindik tişt hatine nivîsandin, pir hindik tişt hatine gotin; hêj birek tişt hene der heqê wêjevanên wan, kedkarên wan ên çandê, hunermendên wan, jinên wan de bêne nivîsandin. Dengbêj Dilovan ji me re behsa çanda kurdên Qafqasyayê û hin dengbêjan kir. Dengbêj Dilovan behsa Radyoya Êrîvanê û dengbêjî, dengbêjiya li Sovyetê û çawa gihîştiye heta roja îro û behsa hin dengbêjên navdar kir. RÛPEL - 8



## Hozan Dilgeş û hunera protestoyê

### Yekitiya Hunermendên Kurdên Êzdî û TEV-ÇAND'ê ji bo qedirgirtina kar û xizmeta hunermend Dilgeş 'Şeva Xelatkirina Hunermend Dilgeş' pêk anîn

**Gelek komên muzîkê, stranbêj û hunermendên kurd di şevê de amade bûn. Her kesî behsa kar û xizmeta Dilgeş kir, hinekan stranên wî gotin û hinekan jî tenê stranên xwe xwendin. Di rûyê Dilgeş de ken û razîbûn xuya bû. Di şevê de careke din stranên Dilgeş, ew stranên ku zû ketin ser zimanê xelkê û bûn dermanê kewandina birînên bi milyonan kesan: Biçûkê Canê, Lêxin Gerîla lêxin, Bêrîvanê, Nisêbîn, Egîdê bi heybet, Muxtaro, Şerê Bagokê, Axa me zêr û zengîn e û hwd. Rûpelên dîroka şoreşekê anîn bîra me. Şoreşa ku îro germahiya wê derbasî qonaxên nû bûye...** RÛPEL - 9

# ROJEV

26 Nîsan- Duşem 2010 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 kr Hejmar: 27

### 1'ê Gulana îsal dê bi heybet be

Ji bo 1'ê Gulanê çend roj mane. Beriya 1'ê Gulanê bê, bûye mijareke bingehîn a rojeva Tirkiyeyê. 1'ê Gulanê îsal dê li qada Taksîmê bê pîrozkirin bandora vê yekê jî di vê de heye. Di 1'ê gulana 1977'an de piştî provokasyonekê komkujiyeke mezin pêk hatibû...

Cûma RONAHÎ - R.2

NÛÇE

### Gelek zozan hatine qedexekirin

Bi hatina biharê re operasyonên Artêşa Tirk jî zêde bûn. Ji ber operasyonan li Kurdistanê qedexeya zozanan jî dest pê kir. Li Colemêrgê ji ber operasyonên leşkerî gelek zozan û herêm ji mirovan re hatin qedexekirin...



R3


POLÎTÎKA

### Bendav xizantir kir

Bendavên li ser Çemê Mûnzûrê ku bi armanca aboriya herêmê bi pêş bixe tên avakirin, dijberî vê yekê gelê herêmê xizantir kir. Ji ber bendavan turîzma herêmê têk çûye û îflas kiriye...

R4

POLÎTÎKA



### Tifaqa qirêj a sêalî aşkera bû

Her roj hevkariyeke qirêj ya di nava Tirkiye û Amerîkayê de dertê holê. Ji vir 2 hefte berê li Stenbolê civîna sêalî hatibû lidarxistin. Ancax derket holê ku Amerîkayê qebûl kiriye ku li dijî PKK'ê sîxuriya lezgîn ya di cih de bide Tirkiyeyê...

R6

# Yekitiya jinên kurd sînor ji holê rakirin

Ji her çar aliyên Kurdistanê û Ewropayê jinên kurd bi hatina xwe ya Amedê sînorên dagirkeran ku ji bo kurdan xêz kirine ji holê rakirin. Nivîskarên rojnameya me yên jin der barê konferansê de nêrînên xwe vegotin

### LI HER DERÊ PÊKANÎN WEKHEV IN

Li Amedê cara yekemîn jin ji bo Konferansa Jinên Kurd civiyan û bi zaravayên kurdî xebatên xwe parve kirin. Jinên ku wekî axêvger tevlî konferansê bûn qala jiyana jinên li herêmên xwe kirin. Di axaftinan de derket holê ku çend wekî erdnîgarî bi sînoran hatine xez kirin jî dîsa jî pêkanînên li hemberî jinan, fikr û ramanên jinan û daxwazên van yek in.

### PÊKANÎNINEKE DIJHIQÛQÎ YE

Aktîvîsta Mafên Mirovan a Norwecê Prof. Kariane Westrheîm ku ji bo beşdarî Konferansa Jinên Kurd bibe hate Tirkiyeyê li Balafirgeha Ataturk a Stenbolê hate binçavkirin û piştre jî hat dersînorkirin. Prz. Reyhan Yalçindag, nerazîbûn nîşanî vê yekê da û got ku Westrheim gelek caran hatiye Amedê û dersînorkirina wê dijhiqûqî ye... RÛPEL - 7





### Jinên Bakur gelo bi kîjan zimanî axivîn?

Duh û pêr li Amedê Konferansa Jinên Kurd a Navneteweyî hebû. Ji 4 parçeyên welat û ji gelek welatên cîhanê jinên kurd beşdarî konferansê bûn. Pêk hatina vê konferansê tiştekî serkeftî bû. Lê, gelo jinên kurd ên ji bakurê Kurdistanê beşdarî vê konferansê bûne xwe bi kîjan zimanî îfade kir. Bersiv zelal e... *Nivîsa A. ZOZANÎ* R.5

**Mamoste XEMREVÎN**

Jinên kurd wekî her car gotinên xwe pratîze kir û dê ji bo pêşerojê bibe mînak. Mirov di vê konferansê de dibîne ku jina kurd gihiştiye asteke gelek girîng. Hemû jin bi coş û heyecan hevdu hembez kirin...

**Mizgîn BÎNGOL**

Ji her 4 parçeyan jinên kurd tevlî konferansê bûn. Pirsgirêkên jinan ya her 4 parçeyan di vê konferansê de gihiştin hev û ev tiştek girîng û taybet e. Her jinek ji parçeyek hatibûn û li Amedê bûn parçeyek...

**Hêvî BERWARÎ**

Gelek konferansê jinan hatin lidarxistin lê konferansek bi vî rengî cara yekem pêk hat. Ji her derê jinên kurd gihîştin hev. Ev tişt bû rakirina sînoran. Fikr û ramanên xwe û serkeftinên xwe parve kirin...

**Necîbe QEREDAXÎ**

Heta ku em hevdû nas nekin nikarin pirsgirêkên xwe jî çareser bikin. Divê karê me yê destpêkê hevdu naskirin be. Bi hesasiyet nêzî hevdu bibin. Hevrebûna me dê yekitiya me xurtir bike...

**Feleknaz UCA**

Cara yekem konferanseke navxweyî pêk tê. Jinên kurd dê yekitiya xwe ava bikin. Careke din derket holê ku pirsgirêkên me hemûyan yek in. Eş û birîn yek in û derman jî yek e û hemû tişt bi hevre dibin...

**Sevahîr BAYINDIR**

Jin ji bo çareseriyê û yekitiya neteweyî berê xwe dan Amedê. Jinên kurd nîşan dan ku dê sînorên li hemberî ziman, dil û mêjû li ser esasê azadiyê ji holê bê rakirin û sînorên azadiya kurdan bê avakirin... RÛPEL.7

# 1'ê Gulana 2010'an dê bi heybet derbas bibe

CUMA RONAHÎ

**Kurd û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê divê li 1'ê Gulanê xwedî derkevin, qadan tijî bikin û bersiva desthilatdaran, mêtingeran û zaliman bidin. Bi vî rengî dê li ruhê 1'ê Gulanê xwedî derkevin**

Ji bo 1'ê Gulanê çend roj mane. Beriya 1'ê Gulanê bê, bûye mijareke bingehîn a rojeva Tirkiyeyê. 1'ê Gulanê îsal dê li qada Taksîmê bê pîrozkirin bandora vê yekê jî di vê de heye.

Di 1'ê gulana 1977'an de piştî provokasyonekê komkujiyeke mezin pêk hatibû. 37 kedkar li wir jiyana xwe ji dest dabûn. Ji 1'ê gulana 1978'an pê de qada Taksîmê ji karkeran re hatibû girtin. Piştî 32 sal di ser re derbas bû qada Taksîmê ji nû ve ji karkeran re vedibe.

Ji ber ku qada Taksîmê ji karkeran re hatiye vekirin divê mirov bi erênî lê binêre. Lê divê mirov binê vê yekê bi xetên qalind xêz bike ku ev ne bexişandina desthilatdarên tirk e. Piştî 1'ê gulana 1978'an hemû kedkarên Tirkiyeyê ligel pekutî û qedexeyan ji bo 1'ê Gulanê li Taksîmê pîroz bike kete nava hewldanên têkoşîneke mezin. Girtin, îşkence û heta kuştin jî li ber çavan girtin. Qewimînên 1'ê gulana 2009'an mînaka vê yekê ye. Tam şerekî kolanan qewimî. Ji ber vê yekê divê li Taksîmê pîrozkirina 1'ê gulana 2010'an rast bê fêmkirin û li gorî vê yekê nirxandin bêne kirin. Çunkî di pêvajoya dawî de li Tirkiyeyê hawira demagojîk ku tê xwestin bê afirandin nêzîkatiyeke wisa ferz dike.

Bala xwe bidinê têkoşîna demokrasiyê ku li Tirkiyeyê tê dayîn û li gorî vê yekê daxwazên gel ên radixîne berçavan dixwazin bikin malê AKP'ê. AKP di vê mijarê de tama dizîtiyê dike. Wisa nîşan dide ku tu dibêje qey heta niha li Tirkiyeyê têkoşîna demokrasiyê nehatiye afirandin û dixwaze hewayeke wiha biafirîne. Têkoşîna demokrasiyê ku heta niha hêzên çepgir, demokrasîxwaz û şoreşgeran dayê red dike, nabîne û bedelên ji bo vê yekê hatine dayîn tune dihesibîne. Van tiştina şêlû dike û weke ku her tişt bi wê hatiye destpêkirin hewayeke wiha diafirîne. Ketiye nava nêzîkatiyekê ku li Taksîmê pîrozkirina 1'ê gulana 2010'an dixwaze ji xwe re bike mal.

Vê nêzîkatiya AKP'ê bi awayekî aşkera demagojî û dizî ye. Heke li Tirkiyeyê têkoşîna hêzên demokratîk û çepgir nebûya, dev jê berdin ku li Tirkiyeyê karker 1'ê Gulanê li Taksîmê pîroz bikin, weke 1'ê Gulanên berê di bin çavdêriya panzerên polîsan û copên wan 1'ê Gulanê pîroz bikirina.

Li Taksîmê pîrozkirina 1'ê Gulanê bi awayekî erênî pêşwazî dikin, lê divê mirov destnîşan bike li ku derê tê pîrozkirin ew qas ne tiştekî jiyanî ye. Ruhê 1'ê Gulanê yê ji kedê, yekitiyê, piştgiriyê û têkoşînê jî vê yekê ferz dike. Ji ber vê yekê 1'ê Gulanê li ku tê pîrozkirin zêdetir, wate û ruhê lê hatiye barkirin girîng e. Ji ber vê yekê 1'ê Gulana 2010'an li gorî vê yekê bê nirxandin û ruhekî wiha lê bê barkirin. Heke ev neyê kirin, çawa AKP li ser destkeftiyên hêzên demokrasiyê yên giştî rûdinê, dîsa dê li Taksîmê pîrozkirina 1'ê Gulanê derbasî xaneya xwe bike û li gorî xwe bi kar bîne. Hêzên demokrasiyê divê bi tu awayî destûrê nedin vê yekê.

Newroza 2010'an kurdan bi hêzên demokrasiyê yên tirkiyeyî û dostên xwe re bi coşeke mezin pêşwazî kirine û mîladeke nû afirandine. Dîsa li Stenbolê hemû hêzên demokrasiyên hatin cem hev û li dar xistina mîtînga Makeqanûna Demokratîk ji eniya xwe ve mudaxeleyî pêvajoya siyasî ya tê jiyîn kirin. Di vê wateyê de nirxên derketine holê, destkeftiyên hevpar ên pîrozbahiyên Newrozê û hêzên demokrasiyê yên mîtînga Makeqanûna Demokratîk li dar xistine. Li Tirkiyeyê hêzên demokrasiyê heke van destkeftiyan ji xwe re esas bigirin dê bi rehetî demagojiya ku AKP dixwaze biafirîne belav bikin û pûç bikin jî. Newroza 2010'an û mîtînga Makeqanûna Demokratîk îspata vê yekê ne.

Pîrozbahiyên Newroza 2010'an û mîtîngên Makeqanûna Demokratîk ne bexişandina hikûmeta AKP'ê ye, ligel hikûmeta AKP'ê destkeftiyên ku kurd û hêzên demokrasiyê yên tirkiyeyî yên afirandine. Di heman demê 1'ê Gulana 2010'an jî weke destkeftiyeke hêzên demokrasî yên Tirkiyeyê û kurdan li xaneya dîrokê bê nivîsandin. Bi vê hişmendî û baweriyê kurd û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê li her cihê lê li 1'ê Gulanê xwedî derkevin, qadan tijî bikin û bersiva desthilatdaran, mêtingeran û zaliman bidin. Dema ev yek pêk bê dê bi awayekî rasteqîn girêdayîna li bîranîn û têkoşîna kedkarên ku ruh û wate dane 1'ê Gulanê pêk bê.

Di vê pêvajoya ku em tê de derbas dibin de ev yek hêj zedetir xwedî watedartir e. Çunkî desthilatdar û hêzên sermayayê kedkaran tune dihesibîne. Li Tirkiyeyê rejîm a şerê taybet li dijî kurdan polîtîkayên komkujiyeke nû xistine dewreyê. Bi vî rengî li Tirkiyeyê ji bo têkoşîn û daxwazên demokratîk ên civakê dibin asteng. Yên ku rê li pêşiya vê yekê jî bigire, weke di sirûda kedkarên navneteweyî ya Enternasyolê de derbes dibe têkoşîn û destên wan e. Kedkarên kurd û tirk 1'ê Gulana 2010'an bike roja biryarbûn û pêkhatina vê yekê û ji daxwazên kedkarên gelê kurd û tirk re bibin bersiv. Bi Hereketeke Demokrasiyê ya Hevpar dikarin avakirina Partiya Siwane pêk bînin. Bi vê hişmendiyê dema nêzî 1'ê Gulana 2010'an bibin, dê 1'ê Gulanê li gorî ruh û wateya xwe bê pîroz kirin û bi vî rengî li girêdayîn bîranîna kesên ku ruh dane vê bimînin.




## Rojname

RODÎ ZINAR

Birastî ez dixwazim behsa hestekê, xemekê, bervedaniyekê bikim, bi kinahî ez ê behsa nameya ku divê her roj bikeve mala û ew name mîna ku; der heqê kur an qîzan mirov li cihekî dûr be û di wê nameyê de agahiyê xwe ragihîne mirov. Divê ew name ev qasî bi hestyarî beyî xwendin û divê ji bo hatina wê nameyê jî ev qasî mirov li bendê bin.

Dema ku namê beyî mala mirov kîjan hestê mirovê beyî bersivdayin.

- ✓ Der heqê bûyerên li welat hene mirovê bibe xwedî agahî.
- ✓ Der heqa dîrokê mirovê bibe xwedî agahî.
- ✓ Der heqa pêkenok û şanoyê de mirovê bibe xwedî agahî.
- ✓ Der der mirovê der heqê tendurustiyê bibe xwedî agahî.

Mirovê der heqê diplomasiya kurd de bibe xwedî agahî.

Haya mirovan ew ê ji kurd ê cîhanê çêbibe.

- ✓ Mirovê di quncik nîvîsa de bibîne ku nivîskarên me pênûsa wan çiqasî mêrxas, dewlemend û xwediyê nirxên azad e, ya herî xweş dinyayek tê avakirin û tu dibe endamekî wê dinya azad û hwd...

Lê dema ku name nekeve mala mirov; mirov ji wê dinya ku kes xwe di ber hev du de feda dike bê par dimîne. Dema ku mirov behsa rojnameyê dike, gelo rojnameyeke çawa û gelo ev bêjeya kurdî rast e yan na dikeve bîra mirov.

Gelo ez exteyar bûme ku ev bêjeya kurdî ev qasî bi xweşa min çûye? An nexweşiya çavên min baş bû ye û ez mafê vê bêjeya kurdî di hêjaya wê de didimê, ji ber ku;

Di ingilîzî de papers.

Di tirkî de gazete.

Di kurdî de name (mektup) ya rojê, ji rojê name, ji rojê agahî, ji rojê bangewazî, ji rojê hişyarî. Dema ku mirov nameyê bibîne; wê demê name xwedîtiyê dixwaze û divê dest lê xwedî derkeve.

Rojname li benda wî destî ye.

Dest jî li benda wê nameyê ye.

Ji bo hêjaya rojnameyê derbikeve holê; mirov dikare behsa ziman û çanda gelê kurd û dijwariya ku jiyaye, ew dîwarê bi kuştin û bi ceza kirinê hatiye avakirin bike. Mirov dikare behsa serîhildana li dijî vê dijwariyê bike ku wê demê ev derxistina vê rojnameyê çiqasî pîroz e, di piştî rojname derket û pêde xwedîlêderketin çiqasî girîng e bike.

Ev dîrokeke kezebşewat e û di heman aloziyê de xwe gihandiye vê rojê û niha ala vê xîret û rûmetê li ser milê Azadiya Welat û Çapemeniya Azad e.

Ji bo girtin û cezakirina rojnameya kurdî; mirov bibêje dadgehek an beşek polîsan bi serê xwe ji rojnameyê re hatiye veqetandin rast e.

Lê tiştekî dinê divê hezar çepik û hezar spasî ji bo xebatkarên rojnameyê be. Bi aboriya ziktêr bûnê xebateke talûke û dijwar dimeşîne, ev qas talûke ji bo hebûna zimanekî bidomîne didin ber çavên xwe.

Ji bo hebûna çanda gelekî bidomîne wê talûkeyê didine berçavên xwe. Cardin hezar çepik û hezar spasî ji bo xebatkarên Çapemeniya Azad hûn her bijîn. Ez dizanim ku hûn gava di 22'yê nîsana 1898'an de li Qahireyê ku ji hêla Miqdat Mithat Bedirxan ve hatiye avêtin dişopîne û çiqas 525 sal ceza bidin we jî ez cardin dizanim ku hûnê vê xebatê bimeşînin.

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mehdi TANRIKULU

Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No:9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan) TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Mehek... Rengek, binevşî **2.**Teref... Bermaya mêwe û zadan **3.** Rojek... Rêxistina polîsan a naziyan **4.**Cephe, bere... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Tîpên navîn ê "saet"ê **5.**Orjînal **6.**Cihê lêdanîna koçeran... Karker **7.**Tûj... Yezdanekî misrî... Cama mîkroskopê **8.**Eşîr, qebîle, hoz... Notayek **9.**Paytexta Îtalyayê... Beyreq, sembola welatan

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.**Peyva neyînî... Di zimanê zarokan de lêxistin... Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin an jî cot dikirin **2.**Mehek... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd. **3.**Notayek... Roja em tê de ne... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû **4.**Temen **5.**Kesê ku mirov wî nas nake, nizane bê kî ye... Dengdêrên "pêça"yê **6.**Navçeyeke Elezîzê... Notayek **7.**Alava ku pê hespan tîmar dikin... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin **8.**Keştiyê ku berê bayê lê ye... Rehîbê Budayan **9.**Notayek... Nepêşekar, kesê ku di kar û barê xwe de bi pêş neketiye

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | O | R | ■ | K | Î | ■ | J | I |
| 2 | A | ■ | E | N | E | ■ | B | Î | R |
| 3 | K | E | ■ | A | W | A | Z | ■ | S |
| 4 | ■ | L | E | M | ■ | M | ■ | M | Î |
| 5 | N | ■ | Z | E | R | ■ | D | E | ■ |
| 6 | A | R | A | ■ | A | M | E | T | A |
| 7 | N | ■ | N | A | ■ | A | P | ■ | M |
| 8 | ■ | S | ■ | J | Û | R | ■ | A | E |
| 9 | O | S | L | O | ■ | S | W | Ê | D |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 4 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 5 | | ■ | | | | | | ■ | |
| 6 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 8 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 9 | | | | | ■ | | | | ■ |

www.arsivakurdi.org

## Ji ber sloganan 3 hezar meh ceza dan

4'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê, der barê 200 girtiyên di Girtîgeha Tîpa E ya Mûşê de tên girtin bi hinceta beşdarî çalakiya şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên Girtîgehê bûne ji bo her kesekî 15 meh cezayê girtîgehê birî.

Yekemîn danişîna doza 200 girtiyên Girtîgeha Mûşê ya bi îdiaya "Dirûşmeyên neqanûnî berz kirine" û "Propaganda rêxistinê kirine" hatibû vekirin, hat dîtin. Di danişînê de heyeta dadgehê ji bo her girtiyekê 15 meh cezayê girtîgehê birî. Xizmên girtiyan cezayê hatiye birîn şermezar kir û diyar kirin ku dê îtîraz bikin. Birayê Huseyîn Bîngol, Mehmet Bîngol diyar kir ku ew dê li hemberî biryarê îtîraz bikin û serî li ÎHD'a Îzmirê bidin.

Ji 200 girtiyên ku rastî cezayê 15 meh hepsê hatine yek jê Huseyîn Bîngol ê niha li Girtîgeha Tîpa I ya Hezro ya Amedê girtî ye. Birayê Bîngol, Mehmet Bîngol nerazîbûn nîşanî cezayê hatiye birîn da û diyar kir ku dê serî li ÎHD'a Îzmirê bide. Mehmet Bîngol, anî ziman ku 6 meh mabû ku birayê wî serbest bê berdan û wiha got: "Em ê bi riya parêzera wî îtiraz bikin. Ligel delîlên îdiaya sloganên; 'Bijî PKK, bimire TC' di destê 4'emîn Dadgehê Cezayên Giran a Wanê de tune jî dîsa li 200 kesî ji bo her kesekî 15 meh ceza biriye. Pêwist bike em ê serî li DMM'ê bidin.

Huseyîn Bîngol ku niha li Girtîgeha Tîpa I a Hezroyê de girtî jî bi riya malbata xwe bertekên xwe nîşan da û anî ziman ku ew li hemberî vî cezayî matmayî maye. Bîngol, destnîşan kir ku wê demê nêzî 800 girtî li girtîgehê hebûn û tu delîlên ku kê kîjan slogan berz kiriye tune. **ÎZMÎR**

# Zozan dîsa qedexe ne!


Wêne: Hamdiye ÇİFTÇİ

**Li Colemêrgê bi zêdebûna operasyonan re gelek zozan hatin qedexekirin. Gundiyan diyar kir ku bi van operasyonan tê xwestin herêmê bê mirov bihêlîn û hemû çavkaniyên wan ên debarê zuwa bikin**

Bi hatina biharê operasyonên Artêşa Tirk jî zêde bûn. Ji ber operasyonan li Kurdistanê qedexeya zozanan jî dest pê kir. Hate zanîn ku li Colemêrgê bi zêdebûna operasyonên leşkerî re gelek zozan û herêm li mirovan hatin qedexekirin.

Her çiqas Waliyê Colemêrgê Muammer Turker diyar kir ku dê qedexeyan ji ser hemû zazonan rakin jî, welatiyan diyar kir ku gelek zozan yekem car li wan hatine qedexekirin. Gundiyan da zanîn ku bi taybetî zozanên Meydan Pemus, Kezîzerî, Çarçela, Çala Xwînê, Zozana Bala ya Gundê Dezê, Zozana Spixane, Zozanên Gundê Kehê bi hinceta operasyon heye li wan hatin qedexekirin. Gundiyan anî ziman ku Walî li gel rayedarên leşkerî gund ziyaret kirin û qedexeyên zozanan bi awayekî devkî ji gundiyan re ragihand. Bi vê qedexeyê re zozanên ku çavkaniya debarê û jiyana welatiyan bû ji welatiyan re hate qedexekirin. Gundiyan, li dijî van qedexeyan bertek nîşan dan û diyar kirin ku tenê çavkaniya debara wan zozan bûn û ew jî li wan hate qedexekirin.

Gundiyan destnîşan kir ku Waliyê Colemêrgê Turker, hefteya borî ligel rayedarên leşkerî di serî de gundên Dêzê, Kehê û gelek gundên ku amadekariya zozanan dikirin ziyaret kirin û ji wan xwest dernekevin zozanan. Gundiyan, daxuyand ku Walî Turker, di ziyaretan de bi devkî gundî agahdar kirin û hate zanîn ku Walî Turker, ji gundiyan xwestiye ku neçin zozanên navborî û wiha gotiye "Operasyon didomin. Dibe ku balafir zozanan gulebaran bikin. Em ji bûyerên ku pêk bên nabin berpirsiyar." Hate zanîn ku Walî Turker aniye ziman ku van bi sedema 'ewlehiya welatiyan' zozan qedexe kirine û daxwazên gundiyan li ber çavan negirtine.

**'Herêmê bê mirov dikin'**

Welatiyê ku li Gundê Dêzê rûdinê û nexwest navê xwe aşkere bike, diyar kir ku hefteya borî Walî Turker hatiye gundê wan û wiha got: "Walî ligel Fermandarê Alayê hate gund. Hemû gundî li qada gund civandin. Piştre Walî axivî û hemû gund û zozanên hatine qedexekirin yek bi yek got û ji me xwest em neçin wan gundan. Me fikar û şikên xwe anîn ziman û me ji walî xwest zonana li me qedexe neke. Lê walî guh neda me. Daxwaza gundiyan li ber çavan negirt. Walî em hişyar kirin û diyar kir ku bûyerê ku pêk bê ew dê ne berpirsiyar be." Gundiyan got bi van qedexeyan dixwazin herêmê vala bikin û bêmirov bihêlin. Gundiyan bang li rayedar û parazvanên mafên mirovan kirin û alîkarî xwestin.

Waliyê Colemêrgê Muammer Turker jî der barê mijarê de got ku îdiayên der barê qedexekirina zozanan de ne rast in û li Colemêrgê qadên nû yên hatine qedexekirin tune ne. Turker, da zanin ku berevajî vê yekê destûr dane 72 zozanan û qedexe ji ser gelek zozanan rakirine. Turker, anî ziman ligel rayedarên leşkerî çûne gundê Kehê lê axaftinek bi wî rengî nekirine." **(COLEMÊRG / DÎHA)**

## Nikarin biçin warên dîrokî

Welatiyên Dêrsimê ji ber operasyon û bombebarandina li herêmê nikarin biçin Malên Bûkê ya dîrokî ku li navçeya Plimoriyayê di nava gel de wekî "Heskîfa Dêrsimê" tên zanîn. Welatiyên ku ligel operasyon û bombeyan dîsa Malên Bûkê ziyaret dikin, diyar kirin ku divê beriya bendav rê li pêşiya van odeyên dîrokî bigire, her kes biçin ziyaret bikin. Welatiyan, anî ziman ku ji ber bendavên herêmê gelek şûnwarên dîrokî di bin avê de mane û cihê mane jî, ji ber operasyonan nikarin ziyaret bikin.

Çiyager Veysel Aksu, nerazîbûn nîşanî operasyonên didomin û avakirina bendav da û wiha got: "Ji ber ewlehiya me tune em nikarin biçin van cihên dîrokî ziyaret bikin." Aksu, di berdewama axaftina xwe re wiha got: "Li gorî rîwayetan ev Ode Beriya Zayinê 2000 sal berê ji aliyê Urartuyan ve hatiye avakirin. Ev Malên Bûkê ku di zinarê bilind de hatine avakirin, dişibe şikeftên Heskîfê. Di van odeyan de sarinc, tunel, îşkencexane û odeyên civînê hene. Lê ev warê dîrokî ji ber operasyonan nayên ziyaretkirin. Divê ev warê dîrokî bê parastin."

Nûnerê Çiyagerî û Sporên Xwezayê yê Munzurê Bulent Ak jî nerazîbûn nîşanî operasyon û bendavan da û wiha axivî: "Ji ber operasyonan turîst û welatî nikarin van Malên Bûkê ziyaret bikin. Niha jî ji ber bendavên ku tên çêkirin dê di bin avê de bimînin. Em dibînin ku Wezareta Turîzmê li vir lêkolînê nakin. Em dixwazin li vir lêkolînê bikin û piştre destûra çêkirina bendavan bên dayîn." **DÊRSÎM**


Wêne: Ferhat ARSLAN

## Xwe dispêrin saziyên jinan

Li Amedê, di nava 3 mehan de 99 jinan, ji ber ku rastî tundiyê hatine û mafên wan hatine binpêkirin, serî li saziyên jinan dan. Jinan ji ber ve rewşê diyar kirin ku pêkanînên hiqûqî li ser kaxizê dimîne û di rewşa jinan de tu tişt naguheriye.

Piştî, bûyera tecawizê ya li Sêrtê, tundiya fizîkî û psîkolojîk, îstîsmara zayendî ya li hemberî jinan hate rojevê. Di nava 3 mehan de 99 jinan serî li Navenda Piştgiriya Hiqûqî û Şewirmendiyê ya Jinan, Mala Jinê ya Kardelen, Navenda Lêkolînkirin û Pêkanînê ya Pirsgirêkên Jinê ya Amedê (DÎKASUM) Komeleya Jinê ya Selîsê, ku li Amedê ji bo jinanxebatan dimeşînin, dan û alîkariya hiqûqî û aborî xwestin. Rêxistinên jinê diyar kirin ku jinên ku serî li wan dane, her meh rastî 3 cureyên tundiyê tên û ji bo alikariya, hiqûqî, aborî û şewirmendiya civakî bigirin serî li wan didin.

Di nava 3 mehan destpêka sala 2010'an de 34 jinan ji bo rêberî û şewirmendiya psîkolojîk, bigrin serî li Mala Jinê ya Kardelenê dane. Ji van jinan 8 kesan ji ber tundiyê, 4 jinan ji bo alîkariya hiqûqî, 9 jinan ji bo kar, 6 jinan ji bo spartinê û 4 jinan jî ji bo alikariya xwarinê serî li komeleyê daye. Her wiha 3 jinên ku teşebusê întîharê kirine jî ji bo girtina alîkariya psîkolojîk serî li Kardelenê daye. Komeleyê jî heta niha dozên van jinan şopandiye, alîkariya hiqûqî daye wan û der barê zaqonên jinê de agahî dane jinan.

Di nava 3 mehan de 22 jinên ku ji cihê xwe hatine koç kirin, serî Komeleya Jinê ya Selîsê dane. ji van jinan 13 kesan ji bo girtina şewirmendiya psîkolojîk serî li Komeleye daye. Jinekê ji ber tacîzê, yekî ji bo spartinê û 7 jinên ku teşebûsê întîharê kirine ji bo alîkariya psîkolojîk serî Komeleya Selîsê dane.

Saziyên jinan balkişandin ku di warê pirsgirêkên jinan de sererastkirinên ji bo çareseriya pirsgirêkan hatine çêkirin nayên pêkanîn. Saziyan, der birîn ku serlêdanên wan jî ji aliyê saziyên fermî ve bê bersiv tên hiştin û ragihandin ku bi taybet polîs û cendirme li dijî tundiya li hemberî jine tevnagerin. **AMED**

## Yilmazkaya hate bibîranîn

Orhan Yilmazkaya yê ji fermandarên Devrîmcî Karargah (Biryargeha Şoreşger) ê yê ku li Stenbolê di encama pevçûnê de jiyana xwe ji dest dabû di yekemîn salvegera şehadeta xwe de, li bajarê Zurîhê yê Swîsreyê hate bibîranîn.

Nûneriya Biryargeha Şoreşger a li Swîsreyê, bi boneya salvegera şehadeta Fermandarê Biryargeha Şoreşger, Orhan Yilmazkaya merasîma bibîranînê li dar xist.

Piştî rêzgirtina ji bo şehîdan, nameya ji Navenda Biryargeha Şoreşger hatî şandin hate xwendin. Di peyama Fermandariya Biryargeha HPG'ê de jî hate diyarkirin, Yilmazkaya di dîroka tevgera çepgir a Tirkiyeyê de, xwediyê berxwedanekê ye, ku kêm tê dîtin. Di bîranînê de peyamên girtiyên ji doza Biryargeha Şoreşger û Kordînasyona Bolîvar a Parzemînî ya ji Amerîkaya Latîn hate xwendin.

Piştî xwendina peyaman, hunermend Yılmaz Çelîk derkete ser dikê û stranên xwe got. Di pey hunermend Çelik re, sînevîzyona ji dîmenên Yilmazkaya yên ji şerê Bostanciyê û Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk hatî hate nîşandan.

Piştî nîşandana sînevîzyonê, nivîsa Yilmazkaya ya beriya ku jiyana xwe ji dest bide nivîsandî, hate xwendin.

Ber bi dawiya merasima bibîranînê ve, hunermend Suavi derkete ser dikê. Suavî beriya ku dest bi stranên xwe bike, axaftinek kir û got ku ew li hemberî kesên şehîd dikevin bejna xwe ditewîne. Piştî ku Suavî stranên xwe gotin, bîranîn bi dawî bû. **(ZURÎH / ANF)**

# Li dijî şaredariya Wanê lîstik

## Şaredarê Wanê Bekîr Kaya diyar kir ku xebatên wan yên çareserkirina avê tên astengkirin û li dijî wan Waliyê Wanê bi organîze antîpropogandayê pêk tîne û dixwaze gel û şaredariyê bînin li hember hev

Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, nûçeyên der barê şebekeya avê û qutkirina ava bajar de tên weşandin rexne kir û got: "Li dijî me organîzeyek bi rêxistin heye. Serkêşiya vê yekê Waliyê Wanê dike. Kesên ku dixwazin me û gelê me bînin beramberî hev bila paş situyê xwe bibîne." Serokê Meclîsa Giştî ya Bajar Semîra Varli jî diyar kir ku ew ji ber nêzîkatiya Walî di nava hedîhedê dene.

Şaredariya Wanê bi armanca pirsgirêkên şebekeya avê çareser bike ava bajar qut kir û dest bi venihêrtina şebekeyên avê kir. Piştî ava bajar hate qutkirin hin beşên çapemeniyê li gorî xwe nûçe weşandin. Şaredarê Wanê Bekîr Kaya têkildarî nûçeyên hatin weşandin li Şaredariya Bajaroka Çîçeklî daxuyanî dan çapemeniyê. Di daxuyaniyê de Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, Seroka Giştî ya Meclîsa Bajar, Semîra Varli, Serokê Rêxistina BDP'ê ya Wanê Prz. Cuneyt Canîş û endamên Meclîsa Şaredariyê amade bûn.

**'Piştgiriya xwe qut kir'**

Şaredarê Wanê Kaya, diyar kir ku bi armanca bersîvê bide spekulasyonên der barê şaredariyê de tên kirin daxuyaniyê dide çapemeniyê û wiha got: "Li ser xeta avê ya ku ji aliyê Şaredariya Wanê ve hatiye çêkirin 11 gund û 3 bajarok avê digrin. Me bi Îdareya Taybet a Bajar ku berpirsiyarê çareserkirina pirsgirêka ava şaredarî û gundên ku bi qaçaxî avê ji ser xetê digrin e, re hevdîtin çêkir. Kaya, anî ziman ku li şûna bi hev re pirsgrêkê çareser bikin, ev 4-5 meh in Waliyê Wanê ji caresekiyê direve û xwe dide paş. Kaya, anî ziman k Walî dibêje 'Ez nabim alîkar' û ji berpirsiyariyê direve. Kaya, destnîşan kir ku piştî dest bi kar kirin Waliyê Wanê ji wan re gotiye "Pereyê me tune, em nikarin bibin alikar" û wiha got: "Beriya ku em avê qut bikin hin kesan ji mere got 'Em dê gel derxin kolanan û rêyan bigrin.' Gote gotên ku dê xebatên me asteng bikin hatin guhê me. Piştî me dest bi xebatê kir got 'Em ne şirîkê vî karî ne û ev gotin li gundan û muxtarên gundan belav kir. Li dijî me gel û gund bi rêxistin kirin."

**'Pirsgirêkê çareser nake'**

Kaya, destnîşan kir gundî piştî vê gotinê bi Sekretera Giştî ya Taybet a Bajar re hevdîtin çêkir. Kaya, da zanîn ku berpirsiyarê pirsgirêka ava Wanê, Waliyê Wane bi xwe ye û wiha got: "Walî li dijî me gel sor dike. Hin kes dixwazin me û gelê me bînin hemberî hev. Lê nikarin bi ser bikevin. Kesên ku dixwazin me û gelê me bînin beramberî hev bila pişt sutuyê xwe bibînin." Kaya, xwest ku kes neyê lîstikan û dê bi gel re pirsgirêkên gel çareser bike.

**Dê avê zêde bikin**

Kaya, destnîşan kir ku dê li gorî pêdiviyên gel borî û şebekeyên avê nû bike. Kaya, pirsêr rojnamegeran ên wekî 'Kî gel li hemberî we bi rêxistin dike? bersivand û wiha got: "Ez bi midûr û personelan re nabim muhatab. Muhatabê min Waliyê Wanê ye. Ez duh bi gundiyan re hatim cem hev, lê li dijî vê yekê dîsa gundî daxistine kolanan. Ez dê hesabê vê yekê ji Walî bipirsim. Ji tu kesên din napirsim.

**Şerma Walî**

Piştre Seroka Giştî ya Meclîsa Bajar Semîra Varli jî diyar kir ku hin kes dixwazin meclîsa şaredariyê û gel bînin beramberi hev û wiha got: "Me ev pirsgirêk ji Sekreteriya Îdareya Taybet a Bajar re ragihand. Lê mixabin tu çareserî pêk neanî. Herî dawî Waliyê Wanê got 'Em xwe bi paşve dikşînin' Tiştekî wisa qet dibe? Em di şexsê Walî de şerm dikin." Varlî, anî ziman ku xebatên ku pêwist e walîtî bike niha şaredarî dike.





## Adil Zozanî

adilzozani@gmail.com

## Siyaseta kurd û ziman

Ewilê vê pirsê bikim: Dema hûn qala PKK'ê dikin, kîjan wêne tê ber çavên we? Ji bo xwe bêjim: Wêneyê sereke yê ji bo min 'Akademiya Mahsûm Korkmaz e'. Di wî wêneyî di tevahiya PKK'ê heye. Ji rêbertiya PKK'ê heta hişmendiya wê ya civakî, PKK piralî di wî wêneyî de dixuyê.

Hûn niha têkiliya vî wêneyî ya bi mijara me re mereq dikin. Bêjim: Heta niha gelek nivîsên li ser kêmahî/zêdehiyên siyaseta kurd ên der barê ziman de hatine nivîsîn. Naveroka piraniya wan nivîsan rexnegeriye. Hinan tûj, hinan nerm… gelek kesan di kesayeta PKK'ê de têkiliya siyaseta kurd û ziman nirxandiye/rexnekiriye.

Min jî hin caran ev mijar daye ber xwe û hewldaye ku nêrîna xwe ya der barê mijarê de binivîsim. Çi maye ku nehatiye gotin? Bersiva vê pirsê di nava kirin û bizavên siyaseta kurd de veşartî ne. Wisa dixuyê ku hê jî tişt mane ku nehatine gotin. Gotin û kirinên siyasetê di warê ziman de çiqas pêşîvekerin; mijara nirxandinê ye.

Li gorî min gotina siyaseta kurd di navê 'Akademiya Mahsûm Korkmaz' de hewandiye. Gelek ji me yên ku têkiliya siyaseta kurd û ziman dinirxînin wî wêneyî ji bîr dikin. Vekera navê PKK'ê (Partiya Karkerên Kurdistanê) bi xwe jî riyekê dide ber mirov, lê navê partiyê ne mimkûn e ku cihê tabelaya Akademiyê bigire.

Wekî wêneyên Akademiyê gelek wêneyên din ên ku paşeroja PKK'ê vedibêjin sehkirin. Hema bêjin tabelayên di piraniya wan wêneyan de dixuyên bi kurdî ne. Îro jî çiyayên welat heman tablo heye. Dewreyên perwerdehiyê, navên saziyan, akademiyên ku îro hejmara wan zêde bûne… Navên tevan bi kurdî ne.

Lê li vir ango li deştê tabloyeke berovajî ya çiyayan heye. Di serî de saziyên têkildarî BDP'ê; tabelayên tevan bi tirkî ne. Saziyên ku tabela jê re ne pêwîst jî navên wan bi tirkî ne.

Rêxistina ciwanan 'Demokratîk Yurtsever Gençlîk (DYG)' (Hemû navên din ên girtine, hemû wisa ne), Saziya Jinan 'Demokratîk Ozgur Kadin Hareketî (DOKH), Sîwaneya civakî, 'Demokratîk Toplum Kongresî (DTK), Saziyên çandî, hemû…

Bi taybetî saziya ciwanan, saziya jinan û sîwaneya civakî; mecbûriyeteke wan a bi fermiyetê re nîn e. Çima navên wan bi tirkî ne? Ji sîwaneyê destpêbikim; çima nabêjin; 'Kongreya Civaka Demokratîk (KCD)'? Ji rêxistina ciwanan re çima nabêjin 'Ciwanên Welatparêz û Demokrat (CWD)'? Li derveyî welat Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) jî heye, Ji rêxistina jinan re çima nabêjin; 'Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (TJAD)? Nivîskara me Mamoste Xemrevînê di nivîsên xwe de bêyî ku pêşniyar bike vê kurdnavê bi kar tîne.

Tekane sedemek heye, hesasiyeta ji bo ziman qels e. Duh û pêr li Amedê Konferansa Jinên Kurd a Navneteweyî hebû. Ji 4 parçeyên welat û ji gelek welatên cîhanê jinên kurd beşdarî konferansê bûn. Ji bo Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad hazîrûna konferanseke bi vî rengî serkeftine.

Lê, gelo jinên kurd ên ji bakurê Kurdistanê beşdarî vê konferansê bûne xwe bi kîjan zimanî îfade kir. Bersiv zelal e. Piraniya wan nekariye xwe bi kurdî îfade bikin. Êrê gelo, ev ne kêmasî ye?

Bi taybetî ji bo jinên kurd tercîhkirina zimanê tirkî sedemê esasî yê elîtbûnê ye. Û pirsgirêka Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk elîtbûnê jî heye. Daketina tevgerê ya tevî jinên kurd a kolanê bi pirsgirêk e. Ev pirsgirêk demildest divê bê çareserkirin.

Ji bo vê jî vegera destpêkê tekane rê ye. Destpêka ku di serî de ji bo jinên kurd bûye sedemê vejînê çima tê jibîrkirin? Şîrove pê navê. Divê em têderxin ku wêneyê 'Akademiya Mahsûm Korkmaz' û sekna me ya îro li hev nakin.

## Xala 15'emîn a makezagonê hate qebûlkirin

Pêşniyara guhertina Xala 15'emîn a Zagona Bingehîn beramberî 71 dengên dijber bi 335 dengan hate pejirandin. Xala navborî di şêwayê avakirina HSYK'ê de guhertinê ferz dike.

Ji bor guhertina Xala 15'emîn a Makezagonê dengdana nepenî hate kirin. 407 parlementer tevli dengdana nepenî ya li meclîsa Tirkiyeyê bûn. Di dengdanê de 335 dengên erê û 71 dengên na û dengek jî pûç derket. Xala 15'emîn a Makezagonê guhertina xala 144'emîn a Venihêrtina Dadger û Dozgeran ferz dike. Li gorî guhertina nû der barê mijarên lêpirsînê yên der heqê dozger û xizmetên dadê de mûfetîşên girêdayî Wezareta Dadê peywirdar in û ev peywir dê ji aliyê wan ve pê kirin.

Her wiha hejmara sindoqên dengdanê yên li meclisê ku berê 2 bû kirin 4. Parlementerên CHP û BDP'ê tevli dengdanê nebûn. **ENQERE**

## Dê Demîrbaş bê emeliyatkirin

Rewşa tenduristiya Abdullah Demîrbaşê Şaredarê Sûrê yê ku di operasyona li dijî BDP'ê de hatibû girtin û ji ber pirsgirêkên xwe yên cidî yên tenduristî, ji mehekê û vir ve ye di nexweşxaneyê de li jêr çavdêriyê ye, hê jî cidî ye û hate ragihandin, ku dê di roja 26'ê nîsanê de, ji ber xitimîna rehên wî Demîrbaş ameliyat bikin. Piştî ku hatibû xwestin, wekî jiyana Demîrbaş di metirsiyê de ye, lewma jî pêwîst e ew bê berdan, lê ev daxwaz hatibû redkirin, hate ragihandin, ku serlêdana parêzeran a duyemîn jî nehatiye pejirandin.

Hate hînbûn, ku ji ber xitimîna rehên Şaredarê Sûrê, Abdullah Demîrbaş wê 26'ê nîsanê, roja duşemê bê ameliyatkirin. Ji ber nexweşiyên giran metirsiya wî ya jiyanê hê jî dom dike, her çend ji bijîşkan rapor girtibe jî, lê ew hê jî nehatiye berdan. Hate zanîn, rîska ameliyata ku dê bê kirin heye. Bijîşkên ku zanyarî dane parêzerên Demîrbaş, rave kirin, ku nexweşiyên wî yên 'hundirîn û tromboz' bi pêş ketiye, heke neyê berdan, dibe ku rîska mirinê derkeve holê. Di vê navê de, hate diyarkirin, di odeya ku Demîrbaş tê de tedawî dibe de, leşkerek û li ber deriyê odeyê jî du leşker li ser nobetê ne.

**Rapor hatibû dayîn**

Têkildarî rewşa tenduristiya Demîrbaş, rapora ku ji aliyê Nexweşxaneya Lêkolînê ya Zankoya Dîcleyê ve hatî dayîn û li ser rapora ku tê de 'Rîska jiyanê heye' hatiye nivîsandin, parêzeran bi daxwaza 'tehliye'yê serî li 5'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê dabûn, lê ev daxwaz hatibû redkirin. Li ser vê biryarê, parêzeran îtiraz kiribû, lê dubare bi biryara redkirinê bi encam bû.

**Serbest nayê berdan**

Di rapora ku ji aliyê Nexweşxaneya Lêkolînê ya Zankoya Dîcleyê ve hatiye amadekirin de, hatibû diyarkirin rewşa tenduristiya Demîrbaş ber bi nebaşiyê ve diçe û di raporê de hatibû gotin, "Ji ber ku kesê nexweş ji ber rewşa genetîk a ku kesekbûna xwînê peyda dike û ji ber tromboembolîsiya hatî derbaskirin a ku metirsiya jiyanî pêk tîne, lewma jî di koma rîska bilind de ye, pêwîst e ji aliyê pisporan ve ji nêzîk ve bê şopandin". Li ser vê yekê, ji bo Demîrbaşê ku rewşa tenduristiya wî her roja ku diçe nebaştir dibe û nayê berdan bang li Parêzvanên Mafên Mirovan, İHD'yê û Rêxistina Efûyê hatibû kirin. Her wiha, bi heman mebestê bi daxwaznameyekê serî li Wezareta Dadê, Komîsyona Lêkolînê ya Mafên Mirovan a TBMM'yê û Miduriyeta Mala Tewqîfê û Cezê ya Wezareta Dadê hatibû dayîn û daxwaz hatibû kirin, ku Demîrbaş bê berdan. Lê di mijara daxwaznameyên hatî dayîn de, ne Wezaretê û ne jî Heyeta Lêkolînê ya Mafên Mirovan heta roja îro tu hewildanek nekirine. **AMED**

## Ji bo siyasetmedarên kurd kampanya dan destpêkirin

BDP'a Antalyayê der barê mijarê daxuyaniyek da çapemeniyê û hat gotin ku ji bo ku siyasetmedarên kurd serbest bên berdan kampanyaya îmzeyan dane destpêkirin.

Serokê BDP'a Antalyayê Îhsan Nergîz anî ziman ku hê ji bo şaredar û rêvebirên BDP'ê îdianema jî nehatiye amadekirin û divê serbest bên berdan. Nergîz da zanîn ku ev pêkanîn herî zêde zirarê dide dewletê û Nergîz wiha axivî: "Ji bo ku hevalên me serbest bên berdan û ev pêkanên neheqî bi dawî bibin me kampanyaya îmezayan da destpêkirin." Nergîz diyar kir ku kampanyayê mehekî bidome û ji bo ku piştgirî bidin kampanyayê banga hestiyariyê kir. Di çarçoveya kampanyê de berhevkirina 15 hezar îmzeyan tê hedefkirin û îmzeyên ku bên berhevkirin dê ji Wezareta Dadê re bên şandin. **ANTALYA**

## BDP'a Licê kongreya xwe pêk anî

Kongreya BDP'a Licê di salona Civînê ya Navenda Çand û Hunerê ya şaredariyê de pêk hat. Serokê BDP'a Amedê Nijad Yaruk, şaredara Licê Fîkriye Aytîn, endamên meclîsa şaredariyê, rêvebirên BDP'ê û gelek BDP'î beşdarî kongreyê bûn. Piştî diyarkirina dîvanê ji bo kesên ku di têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest dane rêz hat girtin.

Nîjad Yaruk di kongreyê de axaftinek kir û bal kişande operasyonan. Yaruk anî ziman ku gelê kurd li hember van operasyonan bêdeng namînin û wiha got: "Di têkoşîna azadiya kurdan de Licê xwedî cihekî girîng e." Yaruk destnîşan kir ku divê gelê navçeyê hesas tevbigerin. Piştî axaftina Yaruk raporên xebat û malî hatin xwendin. Hilbijartin ji yek lîsteyê pêk hat û Sedat Şahînlî bû serokê BDP'a Licê. **AMED**



# Tevneke qirêj a din jî derket holê

**Her roj hevkariyeke qirêj a Tirkiye û Amerîkayê dertê. Ji vir 2 hefte berê li Stenbolê civîna sêalî hatibû lidarxistin. Derket holê Amerîkayê li dijî PKK'ê sîxuriya lezgîn ya di cih de bide Tirkiyeyê qebûl kiriye**

Piştî hevdîtina sêalî ku berî 2 hefteyan li Stenbolê, di navbera Tirkiye, Iraq û Amerîkayê de pêk hat de, hate qebûlkirin ku agahiyên sîxurî, zû radestî Tirkiyeyê bên kirin.

Di civîna sêalî de, Amerîkayê qebûl kir ku “di cih de agahiyan” di nava 24 saetan de radestî Tirkiyeyê bike.

Di demeke ku komkirina leşker û cebilxane li ser sînorên başûrê Kurdistanê zêde dibin û tê gotin dê operasyona dersînor bê destpêkirin, biryara Amerîka ya radestkirina "di cih de radestkirina agahiyên sîxurî" manîdar hate dîtin.

**Sîxuriya kur, kur dikin**

Çavdêrên siyasî destnîşan kirin ku daxwaz ji aliyê Tirkiyê ve hat û Amerîkayê jî, piştî demekê qebûl kir û got: "Di dema herî nêzîk de ew ê agahiyan bidin."

Çapemeniya tirk derbarê mijarê de agahî dan û got: Amerîkayê soz da ku, ew ê der barê PKK’ê û gerîlayên HPG’ê de, agahiyan di nava 24 saetan de, radestî yekîneyên artêşa Tirk bike.

**Fermandariya tirk a Başûr**

Rojname diyar dikin ku, li Biryargeha Hewlêr 3 Fermandarên tirk dimînin.

Çapemeniya tirk li ser mijara serdana Serokê Lîsteya El Iraqiye Iyad Allawî ya Enqereyê jî, radiweste û dibêje: “Mijara sereke ya di hevdîtina bi Iyad Alawî re, pirsgirêka PKKê ye.”

Tê zanîn ku berî çendekî endamê Konseya Rêvebir a Koma Civakên Kudistanê Kalkan, destnîşan kiribû ku tê xwestin rêvebiriya Herêma Federal a Kurdistanê jî tevli hevkariya sêaliyan bikin û wiha pêde çûbû: “Tê xwestin dora Hereketa Azadiya Kurd teng bikin, dorpêç bikin. Hêzên Artêşa Tirk amadekariyên operasyona derî sînor dikin, lê newerin û cesaret nakin.”

**Gel pêşî li êrîşan dibire**

Ji bo careke din wek têkçûna Zapê têk neçin dixwazin hêzên hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê jî ligel xwe tevî şer û êrîşan bikin. Lê piştgiriya gel hemû aliyan dixe nav fikarê. Di şerê Zapê de gelê Bamernê singa xwe da ber tang û topên tirk û destûr nedan biçin ser gerîlayên PKK’ê. ENQERE

# Li Taylandê xwepêşandan

Serokwezîrê Taylandê pêşniyaza xwepêşanderên Kinc Sor red kir. Kinc soran xwestibû ku Serokwezîr parlamentoyê belavbike û ew jî îstîfa bike. Serokwezîrê Taylandî daxwazên xwepêşanderên dijî hikûmetê red kir. Xwepêşanderên Kincên Sor pêşniyar kiribû ku Serokwezîr bi ya wan bike û di nav 30 rojan de parlamentoyê belav bike dê ew jî xwepêşandanên li navenda Bangkok bi dawî bikin. Serokwezîrê Taylendê duh di daxweyaniyeke televizyonê de got ku ew danûstandinan ligel Kincên Sor nake, çimkî ew tûnd û tûjiyê û tirsê bikar tînin. Piştî wî pêşniyara xwepêşandêran red kir, ew dibêjin xwepêşandan dê berdewam bin. Piraniya xwepêşanderan piştevanên serokwezîrê berê ne ku di sala 2006’an de hate daxistin. Ew dixwazin hilbijartinên pêşwext bêne kirin. Aloziya heyî ya ji ber xwepêşandanan ev bû çend hefte didome li Bangkokê bazirganiyê rawistandiye. BANGKOK

# Heft serbaz hatin kuştin

Artêşa Pakistanê ragîhand ku di êrişekî milîtanan ya li nêzîkî sînorê Afganistanê de bi kêmanî heft serbazê pakistanî hatin kuştin û 16 kesên din birîndar bûn. Rayedar dibêjin êrîş li ciheware Datta Xel a herêma eşîretî ya Wezîristana Bakûr pêk hat. Di daxuyaniyeke leşkerî de tê diyar kirin ku ev bûyer di dema serbaz ji bajarê Mîran Şah diçûnê Datta Xel pêk hatiye. Rayedar vedibêjin ku piştî vê operasyon pêk anîne û 15 milîtan kuştine. Ev ji aliyê çavkaniyên herêmî ve nehat piştrastkirin. Artêşa Pakistanê meha borî êriş biribûn ser herêmê û operasyoneke berfire dabû destpêkirin. Her wiha di daxuyaniya rayedarên Pakistanê de tê aşkerakiri ku 4 kesên din bi boneya sîxuriyê dikin ji aliyê milîtanan ve hatine kuştin. Cenazeyê wan li nêzî bajaroka Mîr Elî hate dîtin. ÎSLAMABAD

# Hesabên li ser Allawî

Serokê Lîsteya El Iraqiye ku wek Baasiyên mîratzadeyên Saddam têne naskirin, Îyad Allawî dê biçê Tirkiyeyê.

Lîsteya El Iraqiye, di hilbijartinên dawî de, 91 kursî bi dest xistibûn û wek grubê yekemîn derketibû pêş.

Di demeke ku pêvajoya sazkariya desthilatdariya Iraqê dewam dikê de, piştî serdana komên kurd û sunnî, çûna Îyad Allawî ya Enqerê, balkêş hate dîtin û nirxandin.

Dewleta Tirkiyê, berî hilbijartinan, di hilbijartinan de û di pêvajoya helwdanên sazkariya desthilatdariya Iraqê de, bi alaqeyeke mezin, nêzîkî Baxdatê û grubên li Iraqê dabû. Enqere, kom bi kom, yan jî yeko yeko bangî serkêşên siyasî yên Iraqê dike û li Enqereyê dikê mêvan. Çavdêrên siyasî, destnîşan kirin ku rayedarên tirk, serkêşên siyasî yên Iraqê, yek bi yek vexwendî Enqerê. Ev nîşaniya wê ye ku dixwaze bandora xwe li ser teva sazkar bike û siyaseta xwe bi wan bidê qebûl kirin. ENQERE

# ‘24’ê Nîsanê ji bîr nekin!’

Careke din hêviya ermeniyan ma ji bo bihareke din. Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama di axaftina xwe ya 24’ê Nîsanê ya li ser tevkujiya ermeniyan de bûyerên tevkujiyê yê sala 1915’an wek ‘tevkujî bi nav nekir û li gor daxwaza Tirkiyeyê bi fêlbaziya peyvan mijarê şêlû kir.

Serokê dewleta serkêşê sîstema globalîzma ku dixwaze gelê kurd bike qurban, Amerîka, reşikê- spî Barcka Obama, di salvegera tevkujiya ermeniyan de gotina “Tofana Mezin” bi kar anî.

Serokwezîrê Tirk û dîplomasiya dewleta Tirk ku demeke dirêj, li ber Obama lave kir ku gotina ‘tevkujiya ermeniyan’ bi kar neyne, ne bi giştî be jî, giha armanca xwe.

Serokwezîrê Tirkiyeyê Tayyîp Erdogan ku di serdana dawî ya Amerîkayê de, bihêvî û dexaletên taybet ji Obama xwest ku gotina “tevkujiya ermeniyan” bi kar neyne, piştî ku Obama, di salvegera tevkujiya ermeniyan de, gotina “Mest Yegher - Tofana Mezin” bi kar anî jî, li pêşberî medya û raya giştî ya tirk, nerazîbûna xwe nanî ziman. Li vir jî dîrokê ji nedîtî ve hat û li gor berjewendiyê demî yê Amerîkayê helwesta polîtîk derxist pêş.

**Li hember dîrokê durûtî kir**

Obama, di daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku “di sala 1915’an de, milyon û nîv ermenî hatine kuştin”, lê ji daxuyaniya par cûdatir mijarek lê zêdekir ku ev jî piştgiriya Obama ya ji bo Tirkiyeyê ye. Obama wiha got: “Tirkan ermenî ji tevkujiyê xelas kirin.” Lê negot ka çawan ew xelas kirine.

**Hem kuştiye hem nekuştiye!**

Çavdêrên siyasî û pisporên tevkujiyê, li ser hevoka Obama gotin ku, hem dikujin, hem jî xelas dikin, ev ne mimkun e, Wilo xuya dike ku Obama jî, siyaseta Tirkiyeyê, ya “hem dikuje, hem li ser digirî” qebûl kiriye.

Obama bi vê helwesta polîtîk careke din heviya ermeniyan hişt ji bo bihareke din! Obama di axaftina xwe de xwest ku ‘24’ê Nîsanê neyê ji bîrkirin’. Lê bo ku neyê ji bîrkirin divê mijareke wisa hesas ya dîrokî bi tu şiklî neye îstîsmarkirin. Mixabin ev mijar bi axaftina Barak Obama careke din hatiye îstîsmarkirin û li ser hesabên polîtîk ên Washingtonê tevkujî ji bo bê jibîrkirin di nav herka jiyanê de radestî qedara bê bext hat kirin. AMED



# Li Macaristanê hilbijartina giştî

Duh li Macaristanê hilbijartina tura duyemîn pêk hat. Tura yekemîn roja 11’ê nîsanê pêk hatibû. Di tura yekemîn de 265 parlamenter ji bo bikevin parlamentoyê bi ser ketibûn. Parlamento bi giştî ji 386 parlamenteran pêk tê. Li 57 herêman ku 2 milyon û nîv dengdarên xwe hene tu kesen ji sedî 50’an jortir deng bi dest nexistin û ji bo van herêman duh hilbijartina tura duyemîn pêk hat. Di ve turê de parlamenterên ku dengê zêde bigirin dê bi ser bikevin û biçin parlamentoyê. Li Macaristanê bo ku partî karibin bikevin parlamentoyê divê benda ji sedî 5’a hilbijartinê derbas bikin. Di tura yekemîn de Partiya Ciwan ya Demokratîk bi ser ket û 206 parlamenter xist parlamentoyê. Tê payîn ku ev serkeftin di tura duyemîn de jî bidome. BUDAPEŞTE






# Fîloya Rûsyayê 25 salên din jî li Kirimê ye

Peymana Kirimê di nav Rûsya û Ukraynayê de hat nûkirin. Ji bo vê hin derdor protesto li dar xistin. Amerîka û Yekîtiya Ewropayê jî ji vê razî nîn in. Serokwezîra berê Yulîa Tymoshenko peymana nû hat mohrkirin rexne kir û wek şerma mezin binav kir. Ji ber peymanê Serokdewletê Ukraynayê Vîktor Yanukovîç bi îxanetê sûcdar kir.

Bi vê peymanê 25 sal destûr tê dayîn ku Rûsya fîloya xwe ya deryayî li Derya Reş bihêle. Rûsya ji bo fîloya xwe Sîvastopolê wek baregeha navendî ya derya Reş bikar tîne. Rûsya di berdêla vê de gaza xwezahî bi bihayeke erzan dide Ukraynayê. Yanukovîç pesnê peymanê da û got: “Dê Ukrayna bi vê peymanê barê butçeyê sivik bike. Serokwezîrê Rûsyayê Vladimir Putîn jî mijarê nirxand. Di nirxandina Putîn de tê gotin ku hêla vê mijarê ya aboriyê girîng e, lê mijara herî girîng ev e ku careke din di nav Rûsya û Ukraynayê de pêbawerî hatiye sazkirin. MOSKOW



www.arsivakurd.org

# Jinan sînor rakirin

## Ji Amerîka û Ewropayê bigire heya Iraq, Îran û Sûriyeyê jinên siyasetmedar, akademîsyen, nivîskar hunermend û nûnerên saziyên jinan ji bo konferansa jinên kurd gotin ku gihiştina hevdu dîrokî ye

NAVENDA NÛÇEYAN / AMED

Li Amedê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) û Leyla Zanayê, Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd a bi navê "Di Pêşvebirina Demokrasiyê De Rista Jinan" hate lidarxistin. Di konferansê de bi giştî pirsgirêkên kurdan û bi taybetî jî yên jinan çi ne, hatin nîqaşkirin. Ji înkar û redkirina nasnameyê bigirin heta gelek şiklên şîdetê, yên wekî recm, sunetkirina jinan, kuştin û qetilkirina jinan ên li ser navê namûsê, şîdeta li malê, berdêl, zewaca bi darê zorê, şîdeta cinsî ya ku ji hêla dewletê ve pêk tê, tacîz û tecawiz û qedexekirina zimanê zikmakî, enfala Iraqê û hwd. û şiklên cudahiyên piralî û rêbazên têkoşînê yên bi wan pirsgirêkan 2 rojan nîqaş kirin.

Ji Amerîka û Ewropayê bigire heya Iraq, Îran û Sûriyeyê jinên siyasetmedar, akademîsyen, nivîskar, hunermend û nûnerên saziyên jinan tevlî konferansê bûn. Jinên ku tevlî konferansê bûn gotin ku ev hevcivîna jinên kurd a hemû parçeyan gelek girîng e û dîrokî ye. Jinên kurd gelek cihan cihên cuda cuda mijarên cuda cuda gihiştin hev. Lê cara yekem li Amedê ji bo konferansa jinên kurd civiyan û bi zaravayên kurdî xebatên xwe parvekirin. Jinên ku wekî axaftger tevlî konferansê bûn qala jiyana jinên li herêmên xwe kirin. Di axaftinan de derket holê ku çend wekî erdnegarî bi sînoran hatine xez kirin jî dîsa jî pêkanînên li hemberî jinan, fikr û ramanên jinan û daxwazên van yekin.

Nivîskarên rojnameya me Mamoste Xemrevîn, Mizgîn Bîngol, Hêvî Berwarî, Necîbe Qeredaxî, Felaknaz Uca û Sevahîr Bayindir tevlî konferansa "Di Pêşvebirina Demokrasiyê De Rista Jinan" bûn û der barê konferansê de nêrînên xwe vegotin.



## Delegeya konferansê hate dersînorkirin

Aktîvîsta Mafên Mirovan a Norwecê Prof. Kariane Westrheîm ku ji bo beşdarî Konferansa Jinên Kurd bibe hate Tirkiyeyê li Balafirgeha Ataturk a Stenbolê hate binçavkirin û piştre dersînor kirin.

Aktîvîsta Mafên Mirovan a Norwecê Prof. Kariane Westirheîm, bi boneya beşdarî Konferansa Jinên Kurd ku ji aliyê DOKH'ê ve hatiye amadekirin bibe ji Norwecê hate Tirkiyeyê. Prof. Dr. Karîane Westrheîm, li Balafirgeha Ataturk a Stenbolê ji aliyê polîsan ve bi îdiaya "Di heyata xwe de nikare derbasî sînorê Tirkiyeyê bibe" hate binçavkirin û dersînor hate kirin. Hîndekara Zaningeha Bergen Westrheim, li ser kurdan tezek amade kiribû û ev li Yekitiya Ewropayê 6 sal in Serokatiya Lijneya Konferansa Kurdan dike.

Parêzvana mafên mirovan Prz. Reyhan Yalçindag, bertek nîşanî vê yekê da û diyar kir ku Westrheim heta niha gelek caran hatiye Amedê û beşdarî şahî û xebatan bûye. Yalçindag anî ziman ku bi vê helwestê tê xwestin ku jinên kurd tenê bên hiştin û bûyer dijhiqûqî nirxand. **AMED**



## Beş bi beş konferans…

Jinan di konferansa jinên kurd de van mijaran nîqaş kirin û tecrûbe û nêrînên xwe vegotin.

- Bi moderatoriya Mizgîn Bingol beşa yekem a bi navê 'Pirsgirêkên kurd ên siyasî û civakî û her wiha polîtîkayên dewletan ên înkar, îmha û redkirina nasnameya kurd' ji hêla parlamentera Kerkukê a Parlamentoya Iraqê Ala Talabanî, hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, Prof û akademîsyên Kajal Rahmanî, şêwirmenda karê jinan Şîrîn Amedî û Suheyla Qazî ve hate nîqaşkirin. Jinan qala herêmên xwe kirin
- Di beşa duyem de jî ji hêla moderatoriya şêwirmenda hiqûqî ya Behram Salîhî Emire Hasan ve pirsgirêkên ku jinên kurd dijî hatin nîqaşkirin. Parlamentera partiya Goran Peyman Ezadîn, Dr. û akademîsyên Choman Hardî, endama DOKH'ê Fatma Kaşan, Sekretera jinan a giştî Songul Morsumbul û seroka KADAV'ê Gulsen Îlker tevlî nîqaşan bû û qala cureyên pirsgirêkên jinan kirin.
- Di beşa seyem de jî perspektîfa jinên kurd ên çareseriyê û rêbazên têkoşînê ji hêla parêzer a baroya Parîs a Hewlêrê Ruşen Werdî Aytaç, endama Koma Aştiyê Gulbahar Çîçek, nûnera Navenda Jinên Azad Şikofe Reshîd Muhammed, seroka Koma Yekîtiya ya parlamenterên jin ên PDK û YNK'ê Suzan Xala Shap û helbestvan Xelat Ehmed bi moderatoriya Ayşegul Dogan nîqaş hatin kirin.
- Bi moderatoriya şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel û bi axaftvanên wekî şaredara Baglarê Yuksel Baran, ji Partiya Komînista Îranê Sabriye Bahmany, ji Partiya Yek-Girtî ya Îslamî Hawraz Sh.A. Hamad, ji Enstutiya Kurdî ya Parîsê parêzer Seve Izol û parlamentera berê ya Parlamentoya Ewropayê Feleknaz Uca ser beşa caremîn a bi navê 'Di pêvajoyên têkoşîna demokratîk de rista temsîla jinan û di warê serkeftina zayenda ciwakî de perspektîfa jinan' nêrînên xwe anîn ziman.
- Di beşa dawiyê de mijara bidestxistina piştgiriya neteweyiya demokratîk de rêbazên jinan çiye ji hêla ji KADEP'ê Yuksel Avşar, HAKPAR'ê Hamiyet Çelebî, ji partiya Goranan, parlamentera KDP'ê Emîne Zikrî, parlamentera YNK'ê Tara Abdulrezaq û parlamentera BDP'ê Sevahîr Bayindir hate nîqaş kirin. Moderatoriya beşa dawiyê ji hêla Mulkiye Bîrtanê ve hate kirin.

Konferansa jinên kurd bi van nîqaşan bi dawî bû.

## Nivîskaran nêrînên xwe vegotin

### Ji bo pêşerojê gavek girîng e

***Mamoste Xemrevîn:*** Wekî jinên din ez jî dixwazim keyfxweşiya ya konferansê bînim ziman. Ez di wê baweriyê de me ku serkeftineke mezin e ji bo jinên kurd û dê bigihîjin encamekî. Demek dirêj bû li ser neteweya kurd nîqaş dihat kirin lê gav nedihatin avetin. Jinên kurd wekî her car gotinên xwe pratîze kir û dê ji bo pêşeroje re bibe mînak. Jinan ligel konferansê di navberan de jî nîqaşan dikir û tecrûbeyên xwe par ve kirin. Mirov di vê konferansê de dibîne ku jina kurd gihiştiye asteke gelek girîng. Hemû jin bi coş û heyecan hevdu hembez kirin. Ji bo azadiya zayendî û civakek demokratîk hevcivîna jinan girîng e. Ji bo çareseriyê divê jin dêngên xwe bigîhin hevdû yê têkoşînek hevpar bimeşînin.

### Li Amedê bûn parçeyek

***Mizgîn Bîngol:*** Ez bi tevlibûna wê konferansê keyfxweşbûm ji bo min hesteke cuda ye. Konferans hezek cuda dide me hemûyan. Ji her 4 parçeyan jinên kurd tevlî konferansê bûn. Pirsgirêkên jinan ya her 4 parçeyan di we konferansê de gihiştin hev û ev tiştek girîng û taybet e. Her jinek parçeyek hatibûn û li Amedê bûn parçeyek. Di konferansê de jin çawa nêzê pirsgirêkên xwe dibin û çawa çareser dikin wan nîqaşan bi hevre dikin. Di konferansê de pir nêrînên cuda jî derketin ev tişt dewlemendiyeke. Her wiha her çar parçeyan jin bi zaravayên xwe rengek cuda da konferasê. Her jinek bi zaravayên kurdî nêrînên xwe anîn ziman. Lê tişta ku balkêş hebû jinên li bakur bi zimanê kurdî nedikarin nêrînên xwe bînin ziman. Kesên ku îngilîzî, erebî, firansî dizanî hebûn ji lê dîsa bi zimanê kurdî diaxivîn.

### Dê sînoran ji holê rakin

***Hêvî Berwarî:*** Gelek konferansê jinan hatin lidarxistin lê konferansek bi wî rengî cara yekem pêk hat. Ji Hewlêre heya Amerîkayê jinên kurd gihiştin hev. Di welatekî de partiyên cuda, saziyên cuda û her wiha her welatên din jinên bi nasnameyê cuda tên nasîn, her fikr û raman li Amedê gihiştin hev. Ev tişt bû rakirina sînoran. Jinên kurd bi fikr û ramanên cuda di mekanekî hevpar de serkeftinan parvekirin. Ev tişt bi saya têkoşînê bû û gihiştin hev. Wekî cejnê bû du roj û wekî mîzginiyek bû. Ev tişt pêşketinek e. Her wiha pêşketina jinê tê wateya pêşketina civakê. Dê bi xebatên wisa serkeftinên mezin bi dest bixin. Gelek tişt hatin ziman di konferansê de ez bawerim ku komîteyeke hevpar ji bo çareseriya pirsgirêka jinan de bê avakirin.

### Hevdû naskirin girîng e

***Necîbe Qeredaxî:*** Ev konferansa nîşaneya rola jinê ye. Hezkirineke cihdeye. Saziyên demokrat yên rengîn ên kurdan hatin konferansê. Li vir rastiyek derket holê ku hewcedariya bi hev re jiyanê heye, hewcedariya qebûlkirina hevdû heye, di her qadê de. Her wiha di konferansê de her beşa jiyanê hate nîqaşkirin, wekî çand, siyasî hwd. Gelek pirsgirêk li ser hevdû hatiye û nehatiye çareserkirin. Lê tişta girîng heye ku em hevdû nasnakin û derbarê hev de agahiyên me nîn e. Heta ku em hevdû nasnekin nikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Divê karê me yê destpêke hevdû naskirin be. Bi hesasiyet nêzî hev bibin. Bihevrebûna me dê yekîtiya me xurtir bike.

### Jin dê yekitiya xwe avabikin

***Felaknaz Uca***: Wê konferansê pîroz û girîng dibînim. Ji çar parçeyan jin hatin û li Amedê pirsgirêkên xwe nîqaş kirin. Cara yekem konferanseke navxweyî pêk tê. Jinên kurd dê yekitiya xwe avabike. Di konferansê de jî derket holê ku pirsgirêkên me hemûyan yek in. Eş û birîn yekin û derman jî yek e û hemû tişt bi hevre dibin. Ev rastiyek e û jin jî di konferansê de rastiyên xwe nîqaş kirin. Hîn caran li hemberî hev reaksiyon derkevin jî dîsa jî ji bo destpêke girîng bû û serkeftinek e. Hesreta bi salan di konferansê de pêk hat. Jin di şer de pira aştiyê ye. Jin bi cil û bergên kurdewarî nabin sembol. Jin, sembola aştî û demokrasiyê ye.

### Jinên kurd bûn mînak

***Sevahîr Bayindir:*** Kurd bi salane hatin parçekirin. Ziman û nasnama wê hate qedekirin. Jinên kurd hesreta bi salan û hestên neteweyî ji her çar parçeyan li bajarê qadîm gihiştin hev. Jin ji bo çaresiyê û yekîtiya neteweyî berê xwe dan Amedê. Konferans dîroka jinên kurd e.

Li welatên din jî bindestî heye, pirsgirêkên dijwar hene, heya ku ev tişt neyên parvekirin dê çareserî pêk naye. 4 dewletên ku li hemberî kurdan înkar û îmhayê pêk tîne, lê êdî ew dewlet jî xitimiye. Ev pêk anînên li hemberî kurdan dê bê şikandin û sînorên li hemberî ziman, dil û mêjû li ser esasê azadiyê ji holê bê rakirin. Sînora azadiya kurdan bê avakirin. Jinên kurd dê bibin mînak. Ji bo hemû kurdan sînoreke neteweyî bê afirandin.

Zîhniyeta dewletên serdest di ser terzê înkar, îmha, taciz, tecawiz û kuştinê wek hevin. Ew konferans ji bo yekîtiya kurdan gelek girîng e. Ji ber ku demek dirêje bi giştî di nav kurdan de jî konferansek dihat fikirandin. Lê jinên kurd dê bibe mînak. Li hemberî 4 dewletan yek siyaset hewce ye.

Şilan ARAS / ERÎVAN / ANF

# Qirika dengbêjan çanda kurdî radigihîne nifşên nû

Dengbêjan kelepûra kurdî vejiyand. Li hemberî zor û zehmetiyên ku serdestan dane ber gelê kurd wan barekî giran da ser milên xwe û ligel awazên xwe çanda kurdî vejiyandin û ji bo nifşên nû ragihand. Yek ji wan dengbêjan jî Dilovan e. Dengbêj Dilovan rola dengbêjiyê ya ji bo vejiyandina çand û kelepûra kurdî ji bo me vegot. Nirxandinên Dilovan bê şîrove bi we re parve dikin.

**Dengbêjî dîrok wêje û huner**

Dema Yekîtiya Sovyetan, ku te bixwesta tu bi hunerê rabî, diviya te di dawetan de kilam bigotana û bi te qayîl bibûna. Wê hingê, dengbêjî ew bû, wekî te di dawetan de kilam bigotana, di şînan de zêmar bigotana, çi ku şert û mercên wê hingê bi tenê rê dida vê yekê. Wekî din jî, dengbêjî ew bû, ku te kilam bavêtana ser êş û jan û şadiyên kurdan, ew bû, ku te kurdbûn nas bikira û dîrok bida jiyandin…

Hunermendiya kurdî ne bi tenê ew e, wekî mirov derkeve ser dikê û kilaman bibêje; hunermendiya kurdî, dengbêjiya kurdî ew e, wekî mirov psîkolojî, dîrok, felsefe, erdnîgarî, şer, têkoşîn û lehengiya kurdan û jinên kurd nas bike, kilaman bavêje ser van, van bike stran û bike malê gel.

Dewleta Sovyetê bi her awayî ji bo kêmneteweyan derfet dan, lê kurdan nikaribûn ji van derfetan sûdê werbigirin. Îro, xort û xamayên me yên ku li dewletên Sovyetê yên niha dijîn, naxwînin, bi profesyonelî naxebitin, xwe bi pêş ve nabin. Her wiha, jêhatîbûn ne ew e mirov bi tenê hînî muzîka me û çanda me bibe; divê mirov hînî muzîkên gelên cîhanê jî bibe.

**Radyoya Êrîvanê û dengbêjî**

Dengbêjên mîna Garapêtê Xaço û Reşîdê Baso di Radyoya Êrîvanê de kilam gotine û radyoyê timî ev kilam danîne ser, gel li wan guhdarî kiriye. Hemû kilamên li ser heyam û serdemên berê û dengên dengbêjên me yên hêja, di Radyoya Êrîvanê de hatine tomarkirin, radyoyê ev her tim danîne ser û ev bûne malê gel. Kilamên ku niha jî di Radyoya Êrîvanê de datînin ser, yên zemanê berê ne û radyo dikare dengên dengbêjên me yên ku koça xwe ji nava me bar kirine bide ser, cimaet lê guhdarî bike. Kesên di Radyoya Êrîvanê de dengbêjî kirî, di nava demeke diyar de kilam gotine, ev kilamên wan hatine tomarkirin û radyoyê ev tomar her û her danîne ser. Ango dengbêj di Radyoya Êrîvanê de timî nexebitîne, hin ji wan salekê tê de mane, hin ji wan çend rojan, hin ji wan jî çend salan… Lê paşê, ji ber ku deng û kilamên van dengbêjan hatine tomarkirin, ev bûne nemir. Bo nimûne, di Radyoya Êrîvanê de, Garapêtê Xaço 17, Reşîdê Baso 42, Mecîdê Silêman 140 kilam gotine.

**Dengbêj çand veguhestin îro**

Dema Radyoya Êrîvanê hê nû hatî vekirin, van dengbêjên dengxweş kilamên gelêrî peyda kirine û gotine; wekî Şeroyê Biro, Efoyê Esed (ê ku kilama "Bêrîvanê" dibêje). Bo nimûne, gava ku Efoyê Esed kilama "Bêrîvanê" digot, çi qas tiştên têkildarî kurdbûnê hene, giş di serê mirov de zindî dibûn. Her bi wî awayî, gava ku Reşîdê Baso kilamên "Delalê", "Mêvanê" û "Delalo Qurbano" digot, mirov dikaribû bigota, va ye kurdbûn ev e, va ye ez kurd im. Bi van kilaman ve dilê mirov dixwest bi qîreqîr bibêje, ew kurd e. Va ye Radyoya Êrîvanê bi saya serê deng û newayên van dengbêjên me bû radyoya kurdan.



A rast, hin dengbêj in yên ku Radyoya Êrîvanê kirin Radyoya Êrîvanê. Va ye van dengbêjên nemir kirin, ku radyo bigihîje roja me ya îro û bibe malê gelê kurd. Ev dengbêj ev in: Şeroyê Biro, Reşîdê Baso, Efoyê Esed, Memoyê Silo, Şiblêyê Çaçan, Hesoyê Gogo, Paşîkê Efo, Memoyê Pîr, Keremê Anqosî, Ehmedê Têcir, Mecîdê Silêman û yên din. Muzîkjenên me yên ku kedeke mezin dane Radyoya Êrîvanê jî ev in: Egîdê Cimo, Xelîlê Evdila, Şamilê Beko, Elîxanê Paşik, Şaliko, Casimê Cerdo, Mişayê Elîxan, Seyadê Şamê, Torinê Torin, Îşxan, Ezîzê Ezîz... Dengbêjên jin jî ev in: Sûsika Simo, Fatma Îsa, Zadîna Şekir, Belgiya Qadir, Xana Zezê... Dengbêjên Ermenî yên ku bi kurdî digotin jî navên mîna Davidê Xilo, Aramê Dîkran, Hagop, Hîlvant û Garapêtê Xaço bûn. Van hemû dengbêjên me reng dane Radyoya Êrîvanê û bi taybetî jî çand û hunera kurdan.

Yek jî dengbêjine me hene, ku ked dane Radyoya Êrîvanê û çar pênc an jî zêdetir kilam gotine. Va ye yên ku ji damezirana wê û vir ve ye kirine Radyoya Êrîvanê ji aliyê kurdên li çar aliyên cîhanê ve bê guhdarîkirin û bibe malê gelê kurd, ev dengbêj û muzîkjen in. Ev dengbêj û muzîkjen hema bêje bûne nûr û nedera Radyoya Êrîvanê, bûne hîmê Radyoya Êrîvanê.

**Keda Radyoya Êrîvanê pir e**

Piştî qonaxeke diyar, Radyoya Êrîvanê tu hema bêje bû mafya. Mirovan, ji bo ku di Radyoya Êrîvanê de kilam bigotana, êdî bertîl didane hinekan, berîkên hinekan germ dikirin. Hinekan, ji bo ku bikaribûna di radyoyê de kilam bigotana, diarîn penêr, mast û pez didane rêveberiya radyoyê. Piştî salên 1970'yî, di radyoyê de hevalê kî hebûya, hogirê kî hebûya, ew dikaribûn bihatana Radyoya Êrîvanê. Ehmedê Gogê û Xelîl Mûradov mirovên rewşenbîr î hêja bûn, ku keda wan di Radyoya Êrîvanê de pirr bû. Wan digot, bila her kes bê kilamên xwe bibêje. Lêbelê ji ber berjewendîperestiya kesên ku paşê derbasî ser Radyoya Êrîvanê bûn û nexasim jî piştî salên 90'î, Radyoya Êrîvanê zindîtiya xwe ya berê winda kir, êdî wisa bû, kes nayê naçe û jixwe niha tu xebateke tu bibêjî afirîner e nayê kirin. Radyoya Êrîvanê êdî ketiye rewşeke sembolîk; bi tenê navê wê heye, lê bi xwe tuneye... Her wiha, tevî ku di Radyoya Êrîvanê de gelek deng hatine tomarkirin, gelek kasêt winda bûne, bûne birq û birûsk.

Dengbêjên mîna Garapêtê Xaço û Reşîdê Baso di Radyoya Êrîvanê de kilam gotine û radyoyê . Hemû kilamên serdemên berê û dengên dengbêjên me yên hêja, di Radyoya Êrîvanê de hatine tomarkirin



Dilovan

Bê guman. Bo nimûne, em ji Reşîdê Baso dest pê bikin:

**Reşîdê Baso**

Sala 1927'an, li gundê Keleşbegê yê bi ser Talînê ji dayik bûye. Ev gund di sala 1969'an de wêran bû, niha di wî gundî de tu kes namîne. Reşîdê Baso tevî şêşt salan li Êrîvanê jiya, ev çend salên dawî ye derbasî Ewrûpayê bûye, niha 78 salî ye.

Reşîdê Baso dengbêjekî kurdan e. Mamosteyê Reşîdê Baso, Necoyê Cemal e. Ji bo ku em Reşîdê Baso piçekî din nas bikin, hewce ye em Neco Baba nas bikin. Li ba kurdên welatên Kavkazê, jê re dibêjin, Neco Baba û mezintirîn dengbêjê kurd e, lê ji ber ku nekariye di Radyoya Êrîvanê de kilaman bibêje, zêde nehatiye naskirin. Necoyê Cemal (Neco Baba) di sala 1970'yî de mir. Çawa ku li herêma Serhedê Şakiro û Reso heye, Neco Baba jî mîna wan dengbêjekî dengzîz û zor bû. Bi xwe di sala 1918'an de ji Kurdistanê hatibû. Dengbêjekî wisa bû, ku li ba her kesî qedrê wî giran bû. Va ye Reşîdê Baso jî şagirdê wî ye.

42 kilamên Reşîdê Baso di Radyoya Êrîvanê de hatine tomarkirin. Wî kilamên xwe yên "Ûsiv Begê", "Peyayo Qurban", "Felekê" û hê gelek kilamên xwe di Radyoya Êrîvanê de gotiye. Reşîdê Baso kilamên xwe bi newaya kurdan digot, rengê dengê wî, qirika wî jî kurdewarî bû, kurdbûn bi zar û ziman dikir. Kilama Reşîdê Baso ya bi navê "Mêvan" hê jî di nava gel de pirr tê gotin. Yê kilama "Mêvan" pêşî gotî jî, Reşîdê Baso ye. Kilama "Mêvan" bi newaya xwe ve, bi ahenga xwe ve, bi şêwaza xwe ve, belê, bi her tiştê xwe ve bi kurdî bû. Ango di nava wê de tu tiştek tunebû, wekî ne erebî, ne tirkî, ne jî farisî bîne bîra mirov.

Heke di nava bitûnê dengbêjan de çend kesên ku bi her tiştê xwe ve aidî kurdbûnê hebin, va ye ji wan yek jî Reşîdê Baso ye. Bi saya serê van dengbêjên me, çand û hunera kurdan hate parastin û me karî em wê bigihînin roja me ya îro. Wî di salên 1964, 1965 û 1966'an de, ango sê salan pê ve di Radyoya Êrîvanê de kilam gotine.

**Egîdê Têcir**

Egîdê Têcir ji gundê Sincaliyê yê bi ser devera Talînê ye. Bavê wî di Tevkujiya Ermeniyan de hatiye kuştin. Bi xwe ji ber ku tevkujiya ku di heyna Tevkujiya Ermeniyan de anîne serê kurdan jî ji nêzîk ve dîtibû, kilamên kurdî avêtine ser tiştên hatî serî, ew bi dengekî tijî derd û kul gotine.

*"Siyabend dibêêê*
*Merûmê Xecê de rabe*
*Mala te xera be, ez ê ve*
*sibê dinêrim..."*

**Necoyê Cemal**

Mezintirîn dengbêjê kurdên Sovyetê ye. Mirovê ku li dengê wî guhdarî bikira, dixwest hezar carî lê guhdarî bike. Necoyê Babasî kilamên zehf entîqe digot. Çav bi çi biketa, ji ber xwe ve li hev dianî, kilam davête ser û pirr rind jî digot. Necoyê Cemal di rêza Kawîs Axa, Hesen Cizrawî, Şakiro de ye, ango ji wan dengbêjan e, yên ku ji her kesî rindtir gotine, kilamên herî bedew afirandine. Neco ji Kurdistanê hatiye. Li Kurdistanê, çi qas çiya, kulîlk, bedewî, lehengî hebe, Neco temamê van wisa tevî kilaman dikir, ku mirov digot qey mirov li Kurdistanê dijî. Gelek dengbêjên me yên din li ber destên Neco bûne dengbêj.

Lêbelê Necoyê Babasî di Radyoya Êrîvanê de kilam negotiye. Bi raya wî, hefsarê Radyoya Êrîvanê di destên ermeniyan de bû û digot, "Ez naxwazim dengê min di Radyoya Êrîvanê de derkeve". Prensîbên Neco hebûn, bi xwe ji Qersê hatibû. Gelek kilamên ku li ser jinan û qîz û bûkan dihatine gotin rast nedidît, hizra wî ew bû, "Ev li ser navê kurdbûnê tiştên şerm in" û ji ber vê yekê jî, wî kilamên nizama evînî, nizama dilan çu nedigot. 1918'an wan çaxan, ji Kurdistanê hat, 1970'yan wan çaxan mir. Neco dengbêjê dengbêjan bû, şahê dengbêjiyê bû. Ji bo gelek mirovan, mezintirîn dengbêjê kurd, Necoyê Cemal e. Necoyê Cemal dengbêjekî profesyonel bû. Neco di nava dengbêjiya kurdan de ji deryayê dilopek e.

Dibêjin, Neco rojekê li ser rê bûye, diçû ciyekî, çav bi sê keçan dikeve; yek jê ermenî, yek jê kurd, yek jê jî qazax bûye. Neco wê hingê kal e, lê mêrikê hunermend e. Neco hema bêje bi dest xwe re Tîra Eşqê li ser dilê wî dikeve, dil berdide van keçan û radibe di cî de kilamekê davêje ser wan. Pêşî pesnê keça qazax dide, di pey re jî gotinên ku pesnê keça ermenî û kurd didin dike. Lê belê wî bi gotinên ew qasî bedew çê li wan keçan dikir, gava ku mirov carekê guh bida ser, dixwest careke din guh bide ser. Ez wê hingê her çi qasî zarok bûm jî, min bi hezkirineke mezin, bi heweseke mezin lê guhdarî dikir. Ji ber ku bi wan gotinên avêtî ser keçan ve wî hewil dida welatê xwe gilî bike. Paştirê, ji ber vê kilama Neco avêtî ser wan, dilê her sê keçan jî ketiye Necoyê kal.

*"Keçê dînê de were*
*Kerema xwe ra*
*Pişta min bixurîne*
*Heştê û çar salê min*
*xura qîza nediye"*

Li ser van gotinên ku wî avêtiye ser keça qazax, keça Qazax tê pişta Neco dixurîne. Ji ber ku neynûkên keçikê dirêj bûne, Neco pê de diçe, "weke mêrê eceman têkeve bostanê zebeşan... ez qurbana van neynûkên te bim, te xortaniya min anî bîra min..." dibêje, gotinan li ser keçikê û tevgerên keçikê diafirîne, dom pê dike dibêje hey dibêje. Û nazikiya keçikê dîsa jî derdixe pêş. Neco her tiştê ku çav pê biketa, di kilamên xwe de distra, hema bêje ew dikirin nemir. Yek jî, Neco nedixwest kilamên ku li ser Dîwana Sovyetê dihatine gotin bibêje, digot, heke ez herim Radyoya Êrîvanê, ez ê bê gav bimînim kilamên bi vî cureyî bibêjim, lewma jî neçûye Radyoya Êrîvanê.

**Efoyê Ese**

Kesê ku Efoyê Esed nas kiribe, bi tenê ew kes dikare fam bike çi ka çand û hunera kurdan çi ye. Efoyê Esed di sala 1976'an de miriye. Şofêrî dikir.

**Mecîdê Silêman**

Mecîdê Silêman bi tena serê xwe çand û hunera kurdan e. Pirraniya kilamên Mecîdê Silêman kilamên dawetan, kilamên dilan û hezkirinê bûn. Mecîdê Silêman her wiha li bajarekî Ermenistanê, li Aboviyanê, endamê Koma Aboviyanê bû.

**Şeroyê Biro**

Mirov ji dengê wî têr nedibû, lê Şeroyê Biro bi qasî Neco kilam nizanibû, bi qasî wî pirralî nebû. Şeroyê Biro, wexta ku mir, nêzîkî 82 salî bû, her wiha li defê jî dixist û li Tiflîsê dima. 1918'an wan çaxan, ji tevkujiyên li Kurdistanê reviyabû hatibû. 1970'an wan çaxan mir. Dengekî gelekî xweş li ser Şeroyê Biro bû. Şeroyê Biro şêwaza û meqamên hunera Kurdistanê anîbû û ew didane jiyandin. Biro li gundekî Tiflîsê, di zeviyên xelkê de paletî dikir, debara xwe wisa dikir.



KAKŞAR OREMAR
kakshar_oremar@yahoo.de

# Dilgeş û xwendingeha hunera protestokirinê

**Kesî bi qasî hunermend Dilgeş, xayîn baş bi nav nekirin û kesî bi qasî wî nebû xweşawazê serhildanê. Dema 'mohr li muxtar' kiriye jehr û ji bo Egîd velorandî, gelê kurd cihê wî li ser textê dilê xwe çêkir**

## Muxtaro lo muxtaro

Ger conta bavê te bî, tang
û tifing bi te re bî
Ne dûr, nêzî tê geber bî kes
nabêje rehmet li te bî
Muxtaro lo muxtaro mora
muxrar lê bû maro (jehro)

Parastvanê 84'a, xwe firo-
tin wan bi pere
Bûne kuçik bo neyara, xulî
li serê dilgemara
Kurdistanê bû hawar e,
dengê tivinga nale-nale
Tirs ketiye nav muxtara,
tev belabûn li bajara

Wey muxtaro li te poşmanî
ma ev forsa berê kanê
Ser te de herfandin xani
muxtar çima tu nezanî
Ji Iraqê ta Îranê her çar
aliyê Kurdistanê
Rakirin ala jiyanê, Mîta çav
berda bazdanê
Ay lo mîto parî xweşo pêş
çavê te deqa reşo
Navê te ket lîsta reşo ciyê
te bi xwe qebra reşo
Xwesiparî ne karê meye,
berxwedan karê meye
Enî, artêş, serok heye
Dîrok bi xwe li benda meye

## Li Mêrdînê li Bagokê

Li Mêrdînê li Bagokê xwîn
herikî wekî cokê
Şer dewam kir şev û
rokê...
Bijî şerê me li Bagokê, bijî
şerê me li Bagokê

Çiyayê Bagokê bi dare, leş-
ker hat ser bi hezar e
Li wir bûbû axir dewran e
Li ser serê çend hevala, li
ser serê çend hevala

Çav ji dijmin ne şikandin,
şer xweş kirin kem helan-
din
Çiyayê Bagokê hejandin
Dîrok bi zêr neqişandin

Têkoşer û wan serdar sê
firoke anîn xwarê
Bûn ronahî ji me kurdan re

Çiyayê Bagokê bi nav e
xwîn lêherikî wekî avê
Çiyayê Bagokê bi nav e
xwîn lê herikî wekî avê
Bijîn bijîn ey partîzan
Wan şehîdan sed silave ...

Heval Delîl bûbû rêber
xwişka Ayten êriş bir ser
Şahid û misude wan hene
ewan kuştin gelek leşker
Li Mêrdînê li Bagokê xwîn
herikî wekî cokê
Şer dewam kir şev û rokê.

Di wan salan de ku dengê kurdan di qirika wan de hatibû fetisandin, di wan salan de ku kêm kesa dikarî an jî diwêriyan bibêjin: 'Em kurd in...", di wan salan da ku siyaseta înkar û asîmîlasiyona kemalîstan roj bi roj berfirehtir û xwe gehandibû her dera Kurdistanê, dengekî germ û zelal di nava kurdên belengaz û bindest de belav bû ku dilê herkesî xweş dikir.

Ew deng, dengê hunermend Dilgeş bû. Dawiya sala 1952'an li gundekî derdora Nisêbînê li bajarê Mêrdînê hat dinê. Ji malbateke kurdên êzîdî û bi tenbûra bavê xwe ket nava cihana hunera kurdî. Huner di mala wan de tiştekî pîroz bû û ji 15 saliyê û pê ve bi qasî sê salan Dilgeş xwe baş hînî lêxistina tenbûrê kir. Li pey wê kete nava gel û stranên govend û dewata gotin.

Dilgeş di wan salan de zû pêhesiya ku desthilatdarên komara sitemkara Tirkiyê bi çi awayî dixwazin hemû mîras û dewlemendiyên ziman û hunera kurdan tune bikin. Kete nava kar û çalakiyên siyasî û di herêma xwe de bû stranbêjekî hezkirî. Piştî ku şoreş mezin bû, bêtir ket pey karê xwe yê hunerî û di nava gel de gelek hate hezkirin. Hingî xebata kesên weke Dilgeş, Şivan Pewer, Xebat, Şiyar Farqînî, Eyşe Şan, Birader Musikî, Zozan, Gulistan Perwer û hunermendên din bandoreke mezin dibilindkirina hisên gel yên neteweyî list.

Li bakurê Kurdistanê hunermend Dilgeş yek ji wan kesan bûye ku hertim bi saz û dengê xwe di têkoşana ji bo doza kurdantiyê, xebat kiriye. Ji sala 1975'an û pê de dema ku agirê şoreşa bakurê Kurdistanê sal bi sal gûrtir dibû, li rex kar û çalakiyên siyasî, hunera protestkirinê jî hêzeke mezin dida şoreşgerên ku li dijî sîstema înkara komara Tirkiyeyê kar û xebat dikirin. Di wan salan de dengê hunermend Dilgeş wek stranbêjekî niştimanperwer li bakurê Kurdistanê dengekî bilind bû ku bêtir wek deng û berdevikê çîna karker û cotyaran dihat naskirin.

Sal derbas bûn û Dilgeş bi awayekî berfirehtir û profesyoneltir ket nava qada hunerê. Wî bi dengê xwe yê germ carna li ser bedewiya welat, keda şehîdên doza azadiyê, folkolora kurdî û carna jî li ser rûreşiya muxtar û cehşêkên ku bi erzanî dikevin xizmeta dagîrkerên welatê xwe, bi dengekî bilind qêrînên xwe li her çar aliyên Kurdistanê belav kirin.

Di berhemên Dilgeş de rewşenbîriya siyasî-civakî baş tê ber çava. Heya niha wî gelek berhemên baş afirandine ku 9 kasêt û CD ne. Çu caran xwe ji doza Kurdistanê dûr nexistiye. Li ser qehremanên mîna fermandar Egîd, Leyla Qasim, Bêrîvan, Zîlan, Mazlum Dogan û şehîdên rêbaza Kurdistanê stran gotine û ew bi bîr anîne. Carna jî li ser Newroz, şerên weke Bagokê, gerîlayên qehreman, Pêşmerge û dîktatorên weke Xumêynî jî stran çêkirine. Yanî bi giştî Dilgeş hunermendeke ku xwedî hissên nazik e. Dilgeş di xwîndingeha hunera protestokirinê de xwedî îde û ramanên kurdîniyê û aligirê doza karker û zehmetkêşên civakê ye. Çi cara nekariye ji doza kurdîniyê dûr bikeve û heya niha jî li ser karê xwe yê hunermendiyê berdewame.

Roja 24'ê nîsana 2010'an li Melle(girêdayi Bielfeld/Alman)"Yekitiya Hunermendên Kurdên Êzdî û TEV-Çandê" ji bo qedirgirtina kar û xizmeta hunermend Dilgeş " Şeva Xelatkirina Hunermend Dilgeş" pêk anî.

Gelek komên muzîkê, stranbêj û hunermendên kurd li wira amede bûn. Herkesî behsa kar û xizmeta Dilgeş kir, hineka stranên wî gotin û hineka jî tenê stranên xwe xwendin. Di rûyê Dilgeş da ken û razîbûn xuya bû. Wî bi çavên xwe didî ku ciwanên kurd û welatiyên wî li dorê kom bûne û behsa deng, huner, ked û xizmeta wî ya salên dirêj dikin.

Pêkanîna minasibetên wiha pêwîst e di nava me kurdan de bibe kultur û karekî berdewam. Em heya qedir û hurmeta nirxên xwe yên neteweyî negirin, di civaka me de motîve û afirandinên nû çênabin.

Careke din stranên Dilgeş, ew stranên ku zû ketin ser zimanê xelkê û bûn dermanê kewandina birînên bi milyonan kesan: Biçûkê Canê, Lêxin Gerîla Lêxin, Bêrîvanê, Nisêbîn, Egîd bi heybet, Muxtaro, Şerê Bagokê, Nisêybîn, Axa me zêr û zengîne û hwd rûpelên dîroka şoreşekê anîn bîra me. Şoreşa ku îro germahiya wê derbasî qonaxên nû bûye.

Rexneyên ku li ber çava bûn, ev bûn: tunebûna pêşengeheke wêneyên Dilgeş, hemû berhemên wî yên hunerî wek CD xuya nebûn, çêkirina sînevizyonekê li ser karnama jiyana wî ya hunerî pêwîst û ji her tiştekî jî girîngtir wext ji bo nirxandina kar û xebatên Dilgeş yên hunerî nehatibû veqetandin. Di rojên wiha de li ser "berhemên jiyana kesan" bi awayekî berfireh semînar pêk tên. Hunernas, kompozîtor, nivîskar û kesên ku li ser analîza hunerê xwedî îdia û raman in, di merasimên wiha de amade û hemû aliyên kar û xebata wî şirove dikin. Min dixwest Dilgeş hinek li ser serbihûriya xwe û tecrubeyên xwe yên hunerî ji ciwanên kurd re biaxive. Mixabin ev jî tunebû.

Ji hêla din jî ez nizanim hinek kes wek malbat hatibûn piknik û xwarin-vexwarinê an jî hatibûn merasima qedir û hurmeta kesayetiyek kurd!?? Dengê zarokan salon tejî kiribû û ciwan jî li benda straneke rîtmîk bûn ku rabin dîlanê bigirin.!!. Hîvîdarim ji vir şûnda kesên organîzator van xalan li ber çav bigirin. Di rojên wiha da dîsîplîn karekî here girîng e ku gere qet neyê ji bîr kirin.

Bi hemû kêmasiyên ku hebûn, ez vê pênga weke gaveke dîrokî teqdîr dikim.





# Laz Marks li Cizîr û Hezexê hate qedexekirin

Laz Marks li Şirnexê hate qedexekirin. Laz Marksê ku ev saleke li dehan bajar û navçeyan hate nîşandan ji aliyê Qeymeqamê Cizîrê ve hate qedexekirin. Her wiha li Hezexê jî hate qedexekirin. Qeymeqamên van navçeyan bi hinceta ku Laz Marks polîtîk e biryara qedexekirina ji bo pêşandanê ya li Hezex û Cizîrê da.

Laz Marksê ku heta niha zêdî 200 caran hatiye pêşandan li navçeyên Hezex û Cizîrê yên Şirnexê bi hinceta ku zêde polîtîke hate qedexekirin. Laz Marks pêşandaneke şanoyê ya yek-kesî ye û şahîdîbûnên jiyana civakê û pirsgirêkan bi terzê vegotina maçê tîne ziman û şirove dike. Laz Marks Emîce, li Rîzeyê jî ji aliyê şaredariyê ve hatibû gilîkirin û doz lêhatiye vekirin.

Laz Marks di 20'ê nîsanê de dest bi Turneya Mezin a Anatolîayê da destpêkirin û di 22'ê nîsanê de li Amasyayê bû. Di çarçoveya turneyê de xwest ku li Şirnexê jî bê nîşandan. Egîtîm Sen'a Şirnexê ji bo pêşandana Laz Marks a li Hezex û Cizîrê serlêdanên xwe pêk anîn, lê salon jê re nehate dayîn. ŞIRNEX

ROJEV
26 Nîsan 2010 Hejmar: 27 Sal: 1

## Pêla dûyemîn tê?

Meteorologên Brîtanî radigihînin, ku duyemîn ewrê xweliyê ber bi Ewropayê ve dikişe. Ewr îhtîmal e bigihîje ser beşa bakûra Almanya yê. Her wisa ewr beşek ji Danîmarkayê, beşek Swedê, Polonyayê û çend herêmên Ewropaya rojhilat jî bigre. Norveç, Îskoçya û Fînlandiya neçar man ku dîsa çend balafirgehên xwe bigrin. Balafirgeha Londonê `Hîtrow` hêj kar dike, lê belê Hêzên Leşkerî yên Hewayî a Brîtanyayê firîna jetên Tayfûn dan sekinandin. Li gor ragihandina `Rossia-24` di motora wan de xwelî hatiye peyda kirin. Heya naha zêdetirî 7 mîlyon kesan bûne êxsîrê volkana Îzlandayê... **BERLÎN**





# Bafirok ji bo zarokên girtî *firandin*

Zêdetiri 600 zarokên ku tevlî Şahiya Bafirokan a Enes Ata ku ji aliyê Şaxa Egîtîm Sen'a Amedê ve hate lidarxistin bûn, ji bo zarokên mexdûrên TMK'ê bafirok firandin. Serokê Şaxa Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karahan diyar kir ku di bûyerên 28'ê Adarê de serokwezîr gotiye "Heke zarok be jî, jin be jî çi pêwîst dike, dê bêkirin" û di encamê de jî ewqas kes hatine kuştin.

Şaxa Egîtîm Sen'a Amedê, 4'emîn Şahiya Bafirokan a Enes Ata pêk anî. Şahî, îsal li Çiyayê Kirklarê bi diruşmeya "Bila li bafirokê nexin, ji zarokan re azadî" hat lidarxistin. Zêdetirî 600 zarokan tevlî şahiyê bû. Bi sedan zaorok û malbatên wan ên ku çûn Çiyayê Kirklarê li gel def û zirneyê dîlanê girtin. Zarokên ku bifirok firandin, bi palyaçoyan şa bûn.

**Kuştin bû polîtîka**

Serokê Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karahan der barê şahiyê de bi kurtasî axivî û wiha lê zêde kir: "Em vê şahiyê ji bo Enesê biçûk ê ji aliyê hêzên dewletê ve hat qetilkirin, pêk tînin. Di ser qetilkirina Enes û hevalên wî re 4 sal derbas bûn. Divê rêveberên welat, di 4 salan de ji xwe re hin dersan bigirtana. Lê ev yek ne pêkan e. Çimkî êdî kuştin û hepsikirina zarokan bûye polîtîkayeke dewletê. Rayedarên dewletê bi 23'yê Nîsanê pesnê xwe didin û dibêjin ku di cîhanê de tenê li Tirkiyeyê cejna zarokan heye. Lê niha bi hezaran zarokên ku di dive bafirokan bifirînin, di girtîgehan de ne."

**'Tu tişt neguherî'**

Abdullah Karahan, li ser nîqaşên guhertina makezagonê jî rawestiya û got ku di pakêta AKP'ê de tu guhertineke şênber tune ye. Karahan wiha li axaftina xwe zêde kir:

"Serokwezîr Erdogan di dema bûyeran de digot; 'Heke zarok be jî, jin be jî çi pêwîst dike, dê bêkirin'. Ev hişmendiya Erdogan, piştî 4 salan jî bi heman awayî didome."



# Çavderiyên ji Şengalê...



Şahan DÎCLE - ŞENGAL / ANF

**Gelê Şengalê baweriya xwe di çanda xwe de û çanda xwe ji di baweriya xwe de parastiye. Zilm û zordariya li ser gelê wê hê jî bi dawî nebûye. Ji ber baweriya wa, ew her tim cuda tên dîtin û her wiha tu xizmet jî ji bo vî gelî nayê kirin**

Em di nava hişmendiya tevlihev de, bi heybet û xweşikahiya Şengalê şiyar dibin. Dema mirov ewil dibînin bi newal û xweşikahiya xwe çiyayê Gabarê bi mirovan dide hîskirin. Kurdên êzîdî çiyayê Şengalê ji bo xwe wekî parêzgehê dibînin û her wiha kedeke mezin jî danê. Li dora axeke ku ji 4 metrekareyî pêk tê dîwarên 3 metre lêkirine û dikin baxçe. Bi vê rewşa xwe dîmenên rezan bi mirovan didin hîkirin. Li dora newalê baxçeyên bi vî rengî her diçin dirêj dibin.

Em di nava dîmenên bi heybet yên Şengalê de, di riyên ku bi vîrajkirin de derdikevin rê. Li hin cihan hêj gund hebûna xwe diparêzin. Di nava axa xwe de xanî hatine lêkirin. Bi dîmena xwe ya belavbûyî jî cudahiya xwe ya ji gundê Kurdistana Federal û gundê Iraqê derdixe holê. Her kesî di nava axa xwe de xaniyê xwe çêkirine û ev yek jî nîşan dide ku kurdên êzîdî li sikûnetê dixwazin.

**Li Şengalê…**

Em di nava van dîmenan de derdikevin lûtkeyan. Li kontarê çiya jî bajarê surgun yê Kurdistanê Şengal cih digire. Gelê Şengalê baweriya xwe di çanda xwe de û çanda xwe ji di baweriya xwe de parastiye. Em dîsa riyên çewt re dadikevin xwarê. Vîrajên riyan tengin û mirov her dem bi qezayê re rû bi rûne. Em bi baldarî û bi heyecaneke mezin dadikevin. Şengal bi xaniyên xwe yê egzotîk yên dîrokî ku wekî ku dibêje 'ez dîrokim, şahid ezim' me pêşwazî dike. Ji ber ku şevê bi ser me de girtinbû me her der tam nedî, lê ne mumkun bû ku mirov di bin bandora Şengalê de nemînin.

Piştî demekê em gihiştin navenda Tevgera Azadî û Demokrasî ya Êzdiyan (TEVDA) yê. Nêzî 20 kesî, em pêşwazî kirin. Em jî ji Mexmurê diçûn. Ji bo me çay anîn. Em ji b mîvaniyê wexwendiyê du malan kirin. Gelek zarokên malbatan hebûn. Hemûyan jî awayekî matmayî di nava derî de li me mêze dikirin. Em mereq dikirin. Me hewl da ku em wan nas bikin. Lê wan şerm dikin. Piştî demekê hînê me bûn. Şîlan, Dilgeş, Evîn û Diyana… hemû jî gelek sempatîk bûn. Hele Şîlan pir jîr bû. Hêj 3 salî bû. Xwediyê malê Raka pir dilgerm bû. Hurmeteke mezin da me.

**Zilm didome**

Em ji xwediyê malê Raka dipirsin; Rewşa Şengalê çawa ye hejmara kurdên êzîdî çiqase? Ewil hinek sekinî û bi dilêşiyek mezin wiha got: "Di sala 1411'an de xaniyên 300 hezar êzîdiyê ji aliyê tirkan ve hate şewitandin. Bi deh hezaran bi aweyekî devreyî mirovahiyê hatin kuştin. Ligel tirkan êziyan ji ereban jî zilmên mezin dîtin û her wiha hê jî didome." Raka wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di sala 1975'an de 136 gund bi ser Şengalê ve bûn. Pêvajoya Aşbetalê bi tasfiyeya KDP'ê bi encam bû. Gund hatin valakirin. Em 13 bajarok anîn cem hev. Partiya Baasê ya Iraqê ji bo me asîmîle bikin 136 gund şewitandin û em di bajarokekî de anîn cem hev. Piştî vê jî zimanê erebî li ser zarokên me ferzkirin. Zarokê ku erebî fêrnebûya ew dibirin û careke din agahî jê nedihat girtin.

**'Xwarina we herema'**

Kurdê êzîdî yê bi navê Nasir jî axivî û diyar kir ku ji ber ku gelek ciwanên kurdên êzîdî ji artêşa Iraqê re leşkerî nekiriye hatine qetilkirin. Nasir axaftina xwe wiha berdewam kir: "Rejîma Saddam wahşet bû. Ciwanên ku nediçûn leşker li ber çavê malbatên wan dikuştin. Her wiha pereyê guleyan jî ji malbatên wan digirtin. Piştî ku DYA'yê mudaxaleyê Iraqê kir hêza peşmerge hatin Şengalê. Me ew hembêz kirin. Ligel derfetên kêm xwarin ji wan re dibir. Lê wan xwarina me qebûl nekirin. Ji me re gotin hun kafirin. Em bikuştina evqas zora me dê neçûya. Bi hezar salan in em li ser vê axê dijîn. Lê Kurdistana Federal em hêj qebûl nekirine. Em ji bo wan kafirin.Ger ku rizgariya kurdên êzîdî hebe, ev jî ji destê PKK'ê ye." Dema ku Nasir ev bûyer ji me re vegot rondikên çavên wî jî dihatin xwarê. Serê sibê bi tîrojên rojên he kes goristanan ziyaret dikin.



**Bajarê bêxwedî Şengal..**

Gelê Şengalê ji bo ku tevlî bernameya ku TEVDA organîzekiriye bibin xwe amade dikin. Her kes dizane ku Diyar, Berbang û ji Koma Penaber, Baran tevlî bernameyê dibin. Dema bi roj me Şengal dît em matmayî man. Bajar di nava çopê de mabû. Şaredariya bajar heye. Bi sed hezaran mirov li vir dijîn. Lê bêxweditiya wê di dilê mirovan wekî êşê derbas dibe. Ne rê, ne cihekî şîn û ne jî xebatên binesaziyê hatine kirin.

Di nava qelebalixê de kalekî pir şêrîn û du zarokên biçûk bi ber çavên me dikevin. Kalê bi destê wan girtibû û hatibû cihê qadê. Me navê wan jê pirsî. Navê yekê Ocalan û ya din jî Viyan bû. Berbang derket ser dikî û diyar ewil nêzîkatiya li hemberî Şengalê şermezar kir. Piştre ji bo yekitiyê bang dike. Piştî Berbang, Diyar derdikeve ser dikî.

**Provokasyon**

Coş her diçe mezin dibe. Du kesên bi cilên leşkerî nêzî dikî dibin û ji nûnerên TEVDA'yê re bidin di nava girseyê de bombeya zindî heye. Lê nûnerên TEVDA'yê bi vê yekê bawer nakin. Li ser vê ev kes di nava girseyê de bi deng bang dikin. Dibêjin belav bin di nava we de bombe heye. Gelê Şengalê ji ber êrîşên bombeyî pir kişandine. Bandora ku li ser wan hate kirin dê bi salan bidome.

# Di sporê de serkeftinên mezin

Kompleksa Sporê ya Şaredariya Baglarê sala borî ji bo xizmetê hate vekirin. Ji bo ciwanên navçeyê di warê faliyetên sportîf de bûye navendeke girîng. Di bin bana kompleksa sporê de beşên sporê yên cuda cuda hatine avakirin û her wiha tîmên ku hatine avakirin jî li Tirkiyeyê serkeftinên mezin bi dest xistin.

Şaredariya BDP'e ya Baglarê bi slogana demokratîk, ekolojîk xebatên xwe dimeşîne û her wiha di gelek qadî de xizmetê dide gel. Navçeya Baglarê bi giştî gelê koçber lê bicih bûye û her wiha ji ber pirsgirêkên koçberiyê bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû ne. Nifûsa ciwanan gelek zêde û her wiha daxwaza wan ya ji faliyetên sportîf gelek zêde ye.

Bajar di salên dawî de bi aktîvîteyên çand û hunerê derdikevin pêş û her wiha aktîvîteyên sportîf jî eleqeyeke mezin dibîne. Şaredariya Baglarê bi armanca ku ciwanên xwe teşwîqê aktîvîteyen sportîf bike kompleksa sporê vekir û û ligel futbolê, qadên basketbol, plates, masa tenîsî û voleybolê jî vekirin. Tîmên şaredariya Baglarê di gelek warî bû şampiyon û her wiha roj bi roj serkeftina wan mezin dibe. **AMED**